# CEJNA BIHAR Û BERXWEDANÊ PÎROZ BE



Ji bo tetîla Newrozê hefteya pêşîya me weşana rojnameyê dê nebe.


# bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ Û ŞIROVEYÎ
HEJMAR: 12 / BUHA: 2 TL
20 - 26 ADAR 2017
www.basnews.com



R03

## Hebûna PKKê ya li Şengalê nayê qebûlkirin

Serokê Partîya Sosyalîsta Kurdistanê Mesûd Tek: "Daxwaze me ew e, daxwaza hemû alîyên kurdistanî û hemû kurdên niştimanperwer ew e ku PKK demildest ji Şengalê derkeve."

R06

**REFERANDÛM**

## Dê kurd encamê diyar bikin?

Parlementerê CHPê yê Stenbolê Sezgin Tanrıkulu "Ti gotinek AKPê û Erdoğan ji kurdan re tune ye û ti hêvîya wan ji kurdên ku wêraniyek û travmayek mezin derbaskiriye tune ye."

R08

**NEWROZ Û EDEBÎYAT**

## Bihar û biharîye

Di edebîyata kurdî ya klasîk de Newroz tu caran ji biharê cuda nehatiye hizirkirin. Ji ber ku bihar bi Newrozê dest pê dike, Newroz ji bo biharê wek sembolekê hatiye qebûlkirin û bikaranîn.

R10

**ŞARLO**

## Chaplîn yan zî hêzê bêvengîye

Rejîsorê sînema, kaykerdox, nuştox û komedyeno îngîlîz Charlie Chaplîn, hafizaya merdiman de bi qerakterê "Şarlo"yî (Charlot) ke hetê ey ra ameybî ganîkerdiş ca girewt.






**TIFAQA PKK Û ŞAMÊ:** S2

# PYD ROJAVA TESLÎMÎ ESED DIKE?

**> PYD BI RÊKEFTINAN RE NE DILSOZ E**

Bo aramî û îdareyeke hevbeş li rojavayê Kurdistanê, bi serperiştîya Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî partîyen sîyasî yên TEV-DEM û ENKSê çend civîn pêk anîn, herwiha di Cotmeha 2014an de li Duhokê rêkeftinek jî pêk hat. Lê kiryarên PYDê yên li dijî ENKSê, girtin û zindanîkirina nûnerên partîyên di nava ENKSê de cih digrin, bûn rêgir û PYDê pabendî wan civîn û rêkeftinan nema.

**> ŞERVAN ÎBRAHÎM: KIRYARÊN PYDÊ NE QANÛNÎ NE**

Kiryarên Partîya Yekîtîya Demokratîk (PYD) û Yekitîya Parastina Gel (YPG) yên demên dawî û hevkarîya wan a digel rejîmê bûye cihê nîqaşan. Di derheqê rûdanan de ku li rojhilata navîn diqewimin pispor û siyasetmedarên rojavayê Kurdistanê destnîşanîyê bi kiryarên PYDê dikin û dibêjin PYD - YPG rojavayê Kurdistanê teslîmî rejîma Sûrîyê dike û ti ajandeyeke wê bo kurdan tune ye.




Sê alîyên referandûmê III
**MURAD CIWAN**
RÛPEL 2



Tevgera Apocîyan û rêjîma Esed: Evîna ji alîyekî
**HOŞENG OSÊ**
RÛPEL 4



Gedeyî û Dadî-Babî (1)
**İSMAİL GÜVEN**
RÛPEL 10



Rola rewşenbîr
**JAN DOST**
RÛPEL 12



Arjen Arî
**FIRAT CEWERÎ**
RÛPEL 14



MURAD CIWAN

Sê alîyên referandûmê III

Dor hat ser aliyê sisiyan ê referandûmê; ronahîdana ji perspektîfa pirsa kurdan.

***

Destûreke demokratîk a encama lihevkirina civakî, bêyî qebûlkirina mafên kurdan ên kesayetî û kolaktîfî û misogerkirina wan nabe. Ne destura heyî, ne jî guhetinên anîna sîstema serokatiyê ev rastî hilgirtine nav xwe; herdu jî kurdan tune hesab dikin; bes miletekî homojen ê tirk heye. Loma, sedemekî rasyonel ê naveroka destûrê tuneye ku kurd ne ya heyî, ne jî guhertinên nuh 'erê' bikin.

Dimîne konjuktura siyasî ya nuha; şêla desthilatê û dijbereyan ji alî pirsa kurdan de. Di tarîxa Cumhuriyetê de, cara pêşîn desthilata AKP'ê hebûna kurdan qebûl kir û soza çareseriya pirsgirêkê da. Hin gav hatin avêtin, lê hemî jî nîvco man. Nuha tu viyana çareseriya siyasî nemaye, şerekî bêperwa ê kavilkir di navbera dewletê û KCK-ê de li dar e.

Berpirsê serekî yê şer, helbet hukumeta AKP-ê û serokkomar e. Dewlet di bin berpirsiyariya wan de ye, ew ji çaresernekirinê û her awe bêqanûnî û bêrehmiyên dewletê berpirs in.

Lê dewlet ne yekpare ye, gelek basik tê de ne. Basikên dewletê, gelek caran li hemberî hev, tifaqê li gel hinên din dikin û rêzbûna pirbaskîtîyê, bi giştî, dibe du-sê ber di nav dewletê de. Ew çiqas hevrikên hev bin jî, di hin meseleyên xwedêgiravî neteweyî de, bi hev re ne. Pirsa kurdan jî yek ji wan e ku dewleta tirk bi rast û çepên xwe, bi mihafezekar û dîndarên xwe yên qewmî, bi nîjadperest û sosyaldemokratên xwe ve li serê yekdeng in.

Dawîlêhatina pêvajoya çareseriyê û derketina şerê dawîn, encama biryara dewleta tirk e bi hemû baskên xwe ve, ne ku bi tenê a hukumeta AKP-ê û Erdogan e. Heta, wek yên herî pragmatîst wan karibû ew ji dijminayetiya req a gelê kurd bidûr bin. Lê şerê desthilatdariyê yê navbera Erdogan- Fethulahî-ergenekonîyên wesaytgêr, nîjadperest û 'ulusalciyan'welê kir ku Erdogên ji bo parastina desthilata xwe û ya AKP-ê, di nav dewletê de tifaq li gel ergenekonî-wesayetgêrî û nîjadperestan kir, siyaseta wan a dijminatiya kurdan a req da ber dewletê.

Li pişt vê siyaseta dijminane ya ser kurdan, ne tenê Erdogan û AKP, lê MHP, kemalîst, wesayetgêriya esekerî - burokratîk a ku CHP li parlamentoyê temsîla wan dike, avrasyayî û ulusalciyên ku partiya Perînçek berdevka wan e hene. CHP ne li Bakur tenê, li her çar perçeyan, hevkariya li gel paytextên dewletên dagirker dike, siyaseta fetisandina kurdan dimeşîne.

Heta, di hilhatina şer de, rola şerxwaziya KCK-ê heye. Piştî ku Îmralî ji destê wesayetgêriya eskerî-burokratîk derketiye, ew buye hevkarê xwediyên Îmraliyê yên nuha (hukumeta AKPê), lê berpirsên KCK-ê,li ser xeteka din dimeşin. Rewşa nuh a Îmraliyê zefta Öcalan a li ser KCK-ê qels kiriye. Daxwiyaniyên Bayık ûKarayılan jî diyar dikin ku Öcalan bi lihevkirneka li AKP-ê re bû, lê ew ji serî de li hemberî lihavkirin û aştiyê bûn. Qendîlê tu carî sozên li ser çekdanîn û aştiyê bicîh neanîn. AKP-ê ev didît, lê ji ber hilbijartinan çav li wan digirt. Gava Erdogan ferq kir ku proses wî qels dixe di hilbijartinan de, pihîna xwe li maseya Dolmebahçeyê xist, ew virvirand.

Tevî vê jî HDPê serkeftineka dîrokî bidest xist; 80 parlamenter anîn, bû partiya sisiyê a Tirkiyeyê. AKP-ê piraniya parlamentoyê û îmkana hukumetdanînê wenda kir. Serokkomariya Erdogan ket xeterê.

Hin tiştên din jî bûn. Hemû wan baskên dewletê yên binavkirî, dît ku cara pêşîn kurdan bi rast û çep, alewî û sunî û dîndar û sekulerên xwe şuûra yekrêziya netweyî kir; deng HDPê bi hêviya ku kurd careka din tûşî şerekî nebin, li hemberî şerxwaziya PKK-ê, wan HDP derxist pêş. Vê yekrêziyê, xof xist zikê dewletê; kurdan refleksa netewebûnê nîşan dabû. Hemû bask yekdeng bûn ku ev refleks bê pelaxtin.

Bihêzbûna HDP-ê bi dengê kurdan, selteneta çepên Tirk a nav wê jî hejand. Rengê kurdîtiyê bêtir li HDP-ê veda. HDP'yeka xurt, her wiha Îmralî û Qendîl xist nav gumanan. Îhtîmala ne ku Îmralî, yan Qendîl, lê îdî HDP bibe fermandeyê şer'î yê nav bizava wan û li warê neteweyî û navneteweyî serokatiya Demîrtaş ya Öcalan û Qendîlê li pey xwe bihêle, rû da.

Loma, Îmraliyê û şerxwazên Qendîlê di rapelikandina vî şerê xendekan ê kavilkir de ji bo pûçkirina HDP-ê, bi suîqasdên wek a Ceylanpinarê û îlanên xweseriya şarederiyan ên provakatîf, roleka esasî leyist, her yekî ji wan ji alî xwe ve şer gurr kir.

Zelal e, ne bereya 'na'ya tirkan bi baskên dewletê û sivîl xwe, ne jî şerxwazên KCK-ê, heta sertewînê wan HDP bêguneh in. Ew piştgiriyeka dengê 'na'ya ku desthilatê bihejîne û rê li ber wan veke heq nakin. Tu fêde nagihê kurdan ku ew bejin 'erê', lê ev erênekirin bibe 'nayek' ji bo CHP-ya kemalîst a nunera wesyatgêrên eskerî-burokratîk, û şerxwazên Qendîlê, ê zerarê bide wan.

Tifaqa PKK û Şamê:

# PYD Rojava teslîmî Esed dike?



**HÊMIN DILDAR**

**KARVEDANÊN** Bihara Erebî yên di Adara 2011an de li Sûrîyê dest pê kirin û zêdetir ji 5 salan e berdewam dikin. Gêncên Dara û Hûmûsê yên li dijî rejîma Beşar Esed derketin kolanan, rastî êrîşên tûnd ê rejîmê hatin û di heyva nîsanê de xwepêşandan û şer li seranserê Sûrîyê belav bûn. Herwiha bi beşdarîya hêzên navdewletî û herêmî xwepêşandan tûşî şerekî giran bû. Lewre rêxistinên terorê yên weke Dewleta Îslamî li Iraq û Şamê; El Nûsra, Ahrarûş Şam hwd. jî li ser axa Sûrîyê peyda bûn. Van rêxistinan hem şerê hevdu û hem jî şerê rejîmê kir. Bajarên weke Heleb, Reqqa, Dêrezor, Şam, Hama û Hûmûsê bi mehan û bi salan şahidîya şerên giran kir.

Bo kurdan herçî "başûrê rojavayê Kurdistanê" bû, bi sistbûna fişara rejîmê re, li bajarên Rojavayê Kurdistanê Partîya Yekîtîya Demokratîk (PYD) û Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) dawîya sala 2013an dest danîn ser hinek binke û baregehen rejîma Beşar Esed û li bajarên weke Efrîn, Kobanî û Qamişloyê îdareya "kantonan" îlan kir. Ji alîyê din ve jî, di sala 2014an de li taxên Eşrefîyê û Şêx Meqsûd ên Helebê ku piranîya niştecihên wan kurd in, rejîmê binke û baregehên xwe teslîmî hêzên ser bi PYDê ve kirin.

**PYD pabendî rêkeftinan nebû**

Bo aramî û îdareyeke hevbeş li rojavayê Kurdistanê, bi serperiştîya Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî partîyen sîyasî yên Tevgera Civaka Demokratik (TEV-DEM) û Encûmena Niştimanîya Kurd li Sûrîyê (ENKS) çend civîn pêk anîn, herwiha di Cotmeha 2014an de li Duhokê rêkeftinek jî pêk hat. Li gor biryarên rêkeftinê, alîyên sîyasî yên ENKS û TEV-DEMê dê bi komîteyeke hevbeş di îdare û parastina Rojavayê Kurdistanê de cih bigirta, lê kiryarên PYDê yên li dijî ENKSê, girtin û zindanîkirina nûnerên partîyên di nava ENKSê de cih digrin, bûn rêgir û PYDê pabendî wan civîn û rêkeftinan nema.

Komên ser bi PYD û PKKê ve, bi sîya çekan û bi tesfîyekirina ENKSê di nava du salan de li ser erdê weke hêzêke defakto dest bi îdareya herêmên kurdî kir. Herçend di sibata 2015an û nîsana 2016an de di navbera rejîm û YPGê de li Hesekê pevçûn çebûn jî, ew pevçûn bi mûdaxileya Rûsyayê bi dawî bûn.

**Reddîya navê Rojava û vekişîna ji Heleb û Minbîcê**

PYDê li Kobanî, Girê Spî bi xwe îdareyek danî; li bajarên weke Qamişlo, Efrînê, Herêma Şehbayê paralelî rejîmê îdareyek danî. Di 2yê Adara 2016an de bi beşdarîya serokên kantonan û wezîrên kantonan li Rimêlana Hesekê biryara amadekirina "Destûra Federasyona Demokratîk a Rojava û Bakurê Sûrîyê" dan û dest bi gotûbêjên li ser destûrê kirin. Piştî gotûbêjên digel "meclîsên gel", Desteya Damezirîner a Federasyona Demokratîk a Rojava û Bakurê Sûrîyê, di 27ê Kanûna 2016an de dîsa li Rimêlana Qamişlo kom bûn. Di encama civînên rayedarên PYDê de hat ragihandin ku wan navê "Rojava" ji federasyonê derxistîye û dê navê îdareya nû "Federasyona Demokratîk a Bakurê Sûrîyê" be.

Bihêzbûna rejîma Beşar Esed û şikestina Artêşa Azad a li Helebê, hevkarîya rejîm û PYDê jî zelal kir, lewre piştî peşveçûnên rejîma Beşar Esed, YPGê taxên Şêx Meqsûd û Eşrefîyê radestî rejîmê kirin û hêzên xwe ji wan taxan kişandin. Niha rojeva rayagiştî ya kurdan jî bûye vekişîna YPGê ya ji Minbîcê. Fermandarên rejîma Sûrîyê û Cîgirê parêzgerê Helebê Îmadedîn Xezban ji çapemenîya rejîma Sûrîyê re ragehand ku ew li Minbîcê bi cih bûne û kontrola navçeyê di destê wan de ye.

Kiryarên PYD - YPGê yên demên dawî û hevkarîya wan a digel rejîmê bûye cihê nîqaşan, lewre pispor û siyasetmedarên rojavayê Kurdistanê destnîşanîyê bi kiryarên PYDê dikin û dibêjin PYD - YPG rojavayê Kurdistanê teslîmî rejîma Sûrîyê dike û ti ajandeyeke wê bo kurdan tune ye. Rojnamegerekî li herêmê, ku nexwest navê xwe aşkere bike, bo Basê aşkere kir ku digel Minbîcê PYD û rejîm danûstendinê li ser wê yekê jî dikin ku rejîm derbasî rojhilatê çemê Ferêd bibe û li Girê Spî û Kobanî jî bi cih bîbe.


**Serokê berê yê Opozîsyona Sûrîyê Abdulbasid Seyda: Ne dûr e PYD dê Kobanî jî bide rejîmê**

Karê ku PYD dike her propaganda ye. Hûn dizanin di destpêka şerê Sûrîyê de gotin, em ji bo kurdan şer dikin. Ji civaka navdewletî re gotin em ji bo xelkê Sûrîyê şer dikin, em ji bo gelan şer dikin. Ji destpêkê ve digel rejîmê û Îranê kar dikin. Minbîc stendin, piştre dan rejîmê. Tilabyad bajarekî erebî ye, bo ku bi hestên kurdan bilîzîn navê wê kirin Girê Spî û wisa ma. Li Qamişoyê bi rejîmê re radibin û rûdinên. Li Hesekê jî wisa ye û bi hev re kar dikin. Carê radibin teqeyekê li hev dikin û dîsa li hev vedigerin. Ew şanoyek e. Li Kobanî jî bi hev re kar dikin û haya wan ji hev heye. Ne dûr e PYD - PKK wan bajarên kurdan çol bikin.

**Siyasetmedar Şervan Îbrahîm: Kiryarên PYDê ne qanûnî ne**

Kiryarên vê dawîyê yên PYDê, êrîşên PYDê yên bo binke û navendên ENKSê ne meşrû ne û dûrî mafên mirovan û demokrasîyê ne. PYDê heta niha ti xizmetek bo kurdan nekiriye û dê ji niha pê ve jî neke. Armanca wê ya sereke ew e ku ji cihanê re bêje "Bi tenê ez heme, hêza siyasî û leşkerî ez im." Ji ber ber van sedeman êrîşî ENKSê dikin. Metirsîya wan ew e ku Pêşmergeyên Roj derbasî Rojava bibin. Pêwendîyên wan ê digel Rûsya jî û digel Amerîkayê jî ne phewendîyên stratejîk in lê taktîkî ne. Amerîkî bîr li ser wê yekê dikin gelo ew çekên ku didin YPGê mimkun e sibehê berambetî hevpeymanên wan bêne bikaranîn? Ji ber vê meseleyê jî operasyona Reqqayê hatîye taloqkirin. Li Minbîcê û li herêmên din bi hezaran xort dane kuştin, ji bo çi? Madem ew herêm dê bidana rejîmê çima xort şandin mirinê. Gelek kadroyên serkeftî di şerê Minbîcê de mirin. Karê ku PYD dike ne karekî meşrû ye, ne karekî rewa ye. Aniha jî hewl didin şerê Pêşmergeyan bikin.

Karîkator - Dijwar Ibrahim







## PYDÊ NAVENDÊN ENKSÊ HEMÛ GIRTIN

Êrîşên PYDê yên li ser ENKSê jî berdewam dikin. Îdareya PYDê di nava hefteyê de gef li nûnerên ENKSê xwar û ragihand ku eger ew navêndên xwe negirin ew dê bi ser navendên wan de bigrin. Li bajarê Dêrikê yê rojavayê Kurdistanê, asayîşa PYDê avahîyên partî û rêxistinên ENKSê girtin. Herwiha li gor zanyarîyên heftenameya Basê ji nûnerên ENKSê stendinê, li bajarê Amûdê ofîsa Yekîtîya Ciwanan û li Hesekê jî çend ofîsên ENKSê hatine girtin. Herwiha ofîsên ENKS, PDK-S, Tevgera Ciwanên Kurd û Yekîtîya Jinên Kurdistanê hatine girtin û asayîşê Ala Kurdistanê ji ser wan ofîsan daxistiye.

Derbarê êrîşên PYDê yên li dijî ENKSÊ de Serkirdeyê Partîya Demokratîk ya Kurdistanê li Sûrîyê (PDK-S) Seîd Umer ji BasNewsê ragihand ku PYD bi qûfla sor hemû ofîsên Encûmena ENKSê li bajarên Dêrikê, Amûdê û Serê Kanîyê girtin.

Serkirdeyê PDK-S da zanîn ku, piştî girtina wan ofîsan Asayîşa PYDê çekdarên xwe jî li ber dergehên wan bicih kir. Herwiha Umer got asayîşa PYDê hilmeta xwe li dijî baregehên PDK-S û ENKSê berfireh kiriye û bi biryar e hemû baregeh werin girtin.

## Serokê Partîya Sosyalîsta Kurdistanê Mesûd Tek:

# Hebûna PKKê ya li Şengalê nayê qebûlkirin



M. SALİH BEDİRXAN



**SEROKÊ** Partîya Sosyalîsta Kurdistanê (PSK) Mesûd Tek, berîya bi hefteyekê serdana Herêma Kurdistanê kir û digel Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî civîya. Di hevdîtinê de rewşa siyasî û aborîya Tirkîyeyê û her wiha doza kurdî li Tirkîyeyê xistin ber behs û guftûgoyan. Serokê PSKê Mesûd Tek, derbarê naveroka civîna digel Serok Barzanî û rûdanên dawî yên Rojhilatê Kurdistanê de ji heftenameya Basê re axivî. Mesûd Tek, destnîşanîyê bi rewşa Şengalê dike û aşkere dike ku divê partîyên siyasî yên Herêma Kurdistanê beramber helwêstên PKKê li Şengalê yekhelwêst bin û berjewendîyên Herêma Kurdistanê biparêzin. Tek, wiha dibêje: “Ez vê weke meseleya PKKê û PDKê nabînim. Ev meseleya Herêma Kurdistanê û PKKê ye. Yanî ev meseleya YNKê, meseleya Komala ye, meseleya Yekgirtû ye, meseleya Tevgera Goranê ye. Divê helwesta hemû partîyên Kurdistanê yek bin. Ji ber ew di hikûmetê de cih digirin û hevbeş in. Niha, YNK, Goran, Komala, Yekgirtû, PDK hemû alîyên siyasî hindek kêm hindek zêde di nava hikûmetê de cî digirin.”

**Berîya bi hefteyekê we serdana Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî kir. Piştî serdana we ya digel Serok Barzanî, malpera Serokatîya Kurdistanê daxuyand ku rewşa siyasî ya kurdî li Bakur û geşedanên dawî yên siyasî hatine gotûbêjkirin. Di rojeva we de çi hebû?**

Me behsa çareserîya pirsa kurdî li Bakur, referandûma serokatîya ya li Tirkîyeyê, giştpirsîya serxwebûnê ya başûrê Kurdistanê kir. Me rewşa Rojhilata Navîn û rewşa Sûrîyê gotûbêj kir. Me behsa rewşa kurdan û çareserîyên pirsa kurdî kir.

**Serok Mesûd Barzanî berîya bê Tirkîyeyê ragihandibû ku bo çareserîya pirsa kurdî li Bakur, divê Sellahatin Demirtaş û parlementerên HDPê bên berdan. Herwiha li Enqerê digel serokwezîr û serokkomarê Tirkîyeyê û Ahmet Türk û Sırrı Sakık civiyabû. Di nêzîk de mimkun e prosesa çareserîyê dîsa dest pê bike?**

Berîya Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî here Ewropa û bê Tirkîyeyê me daxwaza gotûbêj û civînê kiribû. Wê demê ji me re hat gotin ku Serok Mesûd Barzanî meşxûl e, piştî ku ji Tirkîyeyê vegerîya em çûn serdana wî. Di hevdîtina me de dê rewşa PKKê çi be, rewşa HDPê çi be, em li ser van meseleyan neaxivîn. Serbestberdana Sellahattin Demirtaş ne di rojeva me de bû.

Serokatîya Herêma Kurdistanê Serok Mesûd Barzanî, Hikûmeta Herêma Kurdistanê Neçîrvan Barzanî, Mam Celal, her tim gotine: “Bo çareserîya pirsa kurdî em amade ne alîkarîyê bikin.” Her tim xwestine pirsa kurdî bi rêya dîyalogê bê çareser kirin. Berê jî navbeynkarî kirine. Eger alîyên din hazir nebin, eger dewlet hazir nebe, eger AKP û hikûmet hazir nebe, eger PKK hazir nebe bi daxwaza Serokatîya Herêma Kurdistanê mesele çareser nabe û prose dest pê nake. Divê her du alî hazir bin. Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî rewşa Tirkîyeyê û siyaseta hikûmeta Tirkîyeyê baş dixwîne. Dema her du alî jî amade bûn, ez wisa bawer dikim dê Serok Mesûd Barzanî texsîr neke û dê navbeynkarîyê û piştevanîya xwe aşkere bike. Aniha tiştekî wisa xuya nake.

> “Ya ku PKK dike nayê qebûlkirin. Li ti deverê nayê qebûlkirin. Divê PKK dev ji wê siyaseta xwe ya çewt û xeternak berde. Eger PKK serwerîya Herêma Kurdistanê binpê bike, Hikûmeta Herêma Kurdistanê mecbûr e serwerîya xwe biparêze, mecbûr e millet biparêze; ji ber wê çendê daxwaze me ew e, daxwaza hemû alîyên kurdistanî û hemû kurdên niştimanperwer ew e ku PKK demildest ji Şengalê derkeve.”

**Ez dixwazim bêm ser meseleya Şengalê, kiryarên PKKê yên li dijî Herêma Kurdistanê bûne cihê nîgeranîyê. Tu kiryarên PKKê yên li Şengalê çawa şîrove dikî?**

Ne tenê, hêzên PKK û YBŞê ku PKKê nav li wan danîye, hemû hêzên ne fermî yên li Şengalê divê ji Şengal û herêma xala 140î derkevin ku ew di destûra Iraqê de weke herêma nakok cî digirin. Divê rêzê ji serwerîya Herêma Kurdistanê re bigirin û li gor biryarên Herêma Kurdistanê rabûn û rûnên. Ya ku PKK dike nayê qebûlkirin. Li ti deverê nayê qebûlkirin. Divê PKK dev ji wê siyaseta xwe ya çewt û xeternak berde. Egr PKK serwerîya Herêma Kurdistanê binpê bike, Hikûmeta Herêma Kurdistanê mecbûr e serwerîya xwe biparêze, mecbûr e millet biparêze; ji ber wê çendê daxwaze me ew e, daxwaza hemû alîyên kurdistanî û hemû kurdên niştimanperwer ew e ku PKK demildest ji Şengalê derkeve.

Ew tiştê PKK bo dewleta Sûrîyê dike bila nêvîyê wê jî bo Herêma Kurdistanê bike, bila daxwazên Herêma Kurdistan qebûl bike. Hêzên xwe ji wir vekişîne, eger na bila bikeve bin emrê Wezareta Herêma Kurdistanê. Mixabin siyaseta xwe sepandinê ya PKKê li Sûrîyê û Iraqê dibe sedema bûyerên nexweş ku kurd ti carî naxwazin ew pêk wêrîn.

**Li alîyê din jî em dibînin ku PYD û alîgirên wê li rojavayê Kurdistanê êrîşî nivîsgehên ENKSê dikin û nûnerên ENKSê zindanî dikin. Tu êrîşên li ser ENKSê çawa şîrove dikî?**

Ez bêjim ev paradoks e û ne tiştekî rast e. Derdora siyasî ya PKKê û HDP ji kiryarên dewletê aciz in. Ev heqê wan e. Dewleta Tirkîyeyê nexwestîye kurd xebatên siyasî û medenî bikin, dewletê pêşîya xebata aştîyê û xebata siyasetê girtiye. Îro jî ev siyaseta dewletê berdewam dike. Nûnerên HDPê di zindanê de ne, şaredarên DBPê di zindanê de ne. Gelek rêveberên HDPê di zindanan de ne. Gelek alîgirên HDPê hatine girtin. Ev tiştên dewlet li Bakur dike, PYD, YPG an jî TEV -DEM li rojavayê Kurdistanê dikin. Kiryarên ne demokratîk xweferzkirin û xwesepandin nayê qebûl kirin.

PKK - PYD gelekî rêz û îhtiramê ji komên çepên tirk, çepên ereb, eşîrên ereb digire; ev tiştekî baş e, em nabêjin tiştekî xirab e. Lêbelê divê rêz û hurmetê li birayên xwe yên başûrê Kurdistanê jî bigirin, rêz û îhtiramê li birayên xwe yên rojavayê Kurdistanê jî bigirin. Rêz û hurmetê li ENKSê jî bigrin, rêz û îhtiram li Partîya Pêşverû jî bigire. Rêzê li ronakabîr û nivîskarên rojavayê Kurdistanê jî bigire. Wê demê em ê bawer bikin YPG - PYD rêxistinên demokrat in û demokrasîyê bo hemû kesî dixwazin. PKK û derdora PKK – YPGê wisa xuya dike ku demokrasîyê bi tenê ji xwe re dixwazin. Dixwazin pêşîya wan xebatan bigirin ku ne bi ser wan ve ne. Vê nimûneyê li Rojavayê Kurdistanê em dibînin. Gelek partî û rêxistinên kurdî ketine ber êrîşên PYDê û asayîşa wan, endamên wan hatine girtin û xebatên wan hatine astengkirin. Ev tişteke ku li dijî demokrasîyê ye. Îmaja rojavayê Kurdistanê xirab dike. Kiryarên şaş in û ne di cî de ne. Zirarê didin kurdan.

> “PKK - PYD gelekî rêz û îhtiramê li komên çepên tirk, çepên ereb, eşîrên ereb digire; ev tiştekî baş e, em nabêjin tiştekî xirab e. Lêbelê divê rêz û hurmetê li birayên xwe yên başûrê Kurdistanê jî bigirin, rêz û îhtiramê li birayên xwe yên rojavayê Kurdistanê jî bigirin.”

**Çima nabin xwedî yek helwest, destkeftî û berjewendîyên Herêma Kurdistanê naparêzin?**

Gelek sedem hene û meseleyên kûr in. Ez naxwazim bêjim bila ew mesele aniha bimînin. Lê ez dixwazim vê yeke jî bêjim. Destên ji derve tên hene, destên dewletên cîran bûne sedem ku partîyên başûrê Kurdistanê yekhelwest nebin. Li dijî hev rawestin.

**Divê hemû partîyên Kurdistanê yekdeng bin**

**Amaje li ser wê çendê hene ku ji ber pêwendîyên PDK - PKKê siyaseta kurdan xetimiye û bûyerên aniha jî ji ber wê yekê rû didin. Tu li ser vê yekê çi difikirî?**

Na ez vê weke meseleya PKKê û PDKê nabînim. Ev meseleya Herêma Kurdistanê û PKKê ye. Yanî ev meseleya YNKê, meseleya Komala ye, meseleya Yekgirtû ye, meseleya Tevgera Goranê ye. Divê helwestên hemû partîyên Kurdistanê yek bin. Ji ber ew di hikûmetê de cih digrin û hevbeş in. Niha, YNK, Goran, Komala, Yekgirtû û PDK hemû alîyên siyasî hindek kêm hindek zêde di nava hikûmetê de cî digirin. Madem wisa ye û muşterek in wê demê divê ew yekhelwest bin. Lê ew yekdeng û yek helwêst nînin. Divê ew navmala xwe rêk bixin, partîyên di nava hikûmetê de ne li hev kom bibin.

Hinek partî wisa tevdigerin ku ew ne di nava hikûmetê de ne. Hindek partî jî wisa tevdigerin tu dibêjî qey ne li Herêma Kurdistanê ne. Wisa tevdigerin ku ev problemên PDKê û PKKê ne. Na, ne wisa ye û di bawerîya min de ew helwesta wan jî ne rast e.





> PKK û derdora PKK – YPGê wisa xuya dike ku demokrasîyê bi tenê ji xwe re dixwazin. Dixwazin pêşîya wan xebatan bigirin ku ne bi ser wan ve ne.

## KIRYARÊN PKKÊ NE RAST IN

Em bi tenê dikarin daxwazê li wan bikin ku berjewendîyên kurdan biparêzin. Em dikarin zextê li PKKê bikin ku dev ji wan kiryarên xwe berde. Kiryarên PKKê ne rast in. Em dikarin zextê li partîyên başûrê Kurdistanê bikin ku berjewendîyên kurdan biparêzin. Zextên me ne zor in û ne tûndî ne, zextên me jî divê dostane bin û aqilane bin. Sibehê DAIŞ têk diçe, tiştên din çêdibin, Haşdî Şabî heye metirsîdar in. Em dikarin wê bêjin, ew hêzên li navçeyê li herêmê hene li dijî kurdan in li dijî destkeftîyên kurdan in.

Destkeftên Herêma Kurdistanê ne destkeftên PDKê ne. Ev destkeftîya hemû alîyên siyasî yên Herêma Kurdistanê ye. Divê parastina van hemû destkeftîyan jî bi hev re be. Helbet hinek problem di navbera PDKê û PKKê de hene, problem di navbera PDKê û Tevgera Goranê de hene, problem di navbera PDKê û YNKê de hene, problem di navbera Goran û YNKê de hene. Lê divê ew problem rê li ber parastina berjewendîyên kurdan negirin. Divê ew pêk ve xebateke hevbeş bikin û bo Herêma Kurdistanê kar bikin.





HOŞENG OSÊ

## Tevgera Apocîyan û rêjîma Esed: Evîna ji alîyekî

Di havîna 2009an de ez ji Sûrî revîyabûm û hatibûm Turkîyeyê. Ji ber ku ez piştgir û alîgirê PKK-PYDê bûm û di rojnameyên Ereb û Kurdan de min parastina PKKê dikir. Hêzên ewlekarîya rêjîma Beşar Esed, di dawîya 2008an de avêt ser mala min da ku min binçav bikin, lê wisa ji ber xwe ve çêbû ku wê çaxê ez ne li malê bûm û ji girtin û binçavkirinê filitîm.

Dema ez li Stenbolê bûm, gelek caran diçûm serdana rojnameya "Özür Gündem". Wê çaxê navê wê "Günlük" bû. Piştî ku rojnameya "Radikal"ê nivîsên taybet ji min xwestin, "Günlük"ê jî nivîsên taybet ji min xwestin. Di gengeşîyekê de berpirsê rûpela "nêrîn - yorum" ya "Günlük"ê ji min pirsî: Ma gelo Heleb ne Kurdistan e? Ez kenîyam. Min ji wî camêrê ku 15 salan di zindanê de maye got; ma te Kobanîyê bihîstîye? Got: Na. Kobanîyê çi ye!? Min dîsa pirs kir: Ma te Efrînê bihîstîye heval? Wî got: Na bi Xwedê.

Ez piçekî hêrs bûm û li ber xwe ketim, lê min xwe girt û ji wî re got: Binêre hevalê T.K. ez dizanim tu ji Çewlikê yî, û tev li ku min Çewlik, Hezro, Varto, Xanê, Licê, Mûşê, Bedlîsê hwd. min di xewnên şevan de jî nedîtiye, lê ez dikarim ji te re navên gund û navçeyên girêdayî van bajaran bêjim. Ev 30 salên we ne, hûn li Sûrî û Kurdistana rojava ne û hun hîna nizanin bê Heleb Kurdistan e yan na? Te navê Efrîn û Kobanîyê nebihîstiye!! Hevalê T.K. tu li ser rêjîma Beşar Esed çi nas dikî? Got: Hafiz Esed baş bû û dostê me bû, lê kurê wî ne baş e. Min pirsî: Wekî din, tu tiştekî ji dîroka Baas nas nakî? Camêr got: Na.

Ez gelekî li ser rewş û dîroka partîya Baas axivîm. Ji min xwest ku ez nivîseke berfireh li ser rêjîma Baas - Esed binivîsînim. Roja 9/3/2010an rojnameya "Günlük" rûpela 13an bi tevahî ji nivîseke min re veqetand û sernivîsa wê gotarê wisa bû: "Çîroka dîktatorîya Baas li Sûrîye". Ez guman dikim ku ew yekemîn nivîsa rexneyî li rêjîma Baasê bû ku di medya PKK de belav bû.

Mebesta min ji vê bîranînê ew e ku mirov dema li hejmarên rojnameya fermî ya PKKê "Serxwebûn"ê ji sala 2011an ta 2016an dinêre, mirov dibîne bê çawa berpirsên PKK yên payebilind ên weke Sabrî Ok, Mustafa Karasu, Duran Kalkan, Cemîl Bayik û Murad Karayılan bûne pehlewan û pispor û lêkolîn û vekolîn û analîzên li ser rewşa Sûrî dinivîsînin. Tu dibêjî qey ji rewşenbîr û akademîsyenên Sûrî jî bêtir û çêtir rewşa Sûrî dizanin! Herwisa berpirsên PKKê di vê rojnamê de ji Kurdên Îraqê bêtir û baştir rewşa Îraq û Kurdistana federe dizanin. Eynî mesele, derbarê Kurdên rojhilatî de, berpirsên PKKê qenc û xweştir rewşa Kurdistana rojhilat dizanin. Ne tenê wisa jî, berpirsên PKK ji Kurdên Îraq, Sûrî û Îranê re şirove dikin ku gerek çi bikin û çi nekin? Û derbarê pirojeyên çareserîyê de, çi ji wan re baş e û çi ne baş e? Le eger tu werî ji wan pirs bikî: Heval, tu dikarî navên 4 serokên Sûrî bihejmêrî? Dê tenê navê Hafiz Esed û kurê wî Beşar Esed bizanibin. Eger tu ji wan bipirsî: Ka ji min re navê 3 hebestvanên navdar ên Sûrî bêje? Dê nizanibe....û her wisa. Ev camêrên han, ji xwe re nabêjin: Di nav PKK de Kurdên Sûrî, Iraq û Îranê hene, berê ew behsa rewş û problem û kêşeyên xwe bikin û li çareserîyê bigerin. Ango di nava PKKê de, qaşo berpirsên payebilind ên"Suriyeli" hene, weke Rustem Cûdî (jîyana xwe ji dest da), Şahîn Çîlo, Bahoz Erdal û Nûredîn Sûfî hwd. Çima nivîsên wan derbarê Sûrî de di "Serxwebûnê" de tune ne!? Lê eger mirov bixwaze rastî û naveroka şêweyên nêzîkatîya PKK ji Kurdên Sûrî nas bike û têbigihîje bê PKK çawa û bi çi rengî li Kurdistana Sûrî dinêre, divê mirov piçekî li dîroka têkilîyê PKKê û rêjîma "Baas - Hafiz Esed" vegere.

Piştî kongreya 2yemîn a PKKê di sala 1982an de û stendina biryara şer, êdî PKK berê xwe da Kurdên Sûrî û dest bi avakirina rêxistina xwe di nava gel de kir, bi taybetî di sala 1983an de. Wê çaxê, têkilîyên PKK û rêjîma Hafiz Esed dest pê kiribû, nemaze piştî dagirkirina Lubnanê ji alîyê Îsraîlê ve û şerê PKK digel tevgerên Filistînîyan li dij wê dagirkirinê. Li başûrê Lubnanê, li "Nabatiye" 10 şervanên PKKê jîyana xwe ji dest dan û gelek şervan dîl hatin girtin. Ew dagirkerî di Hezîrana 1982an de bû. Lê piştî ku PKK kongreya xwe ya 3yemîn li dar xist, êdî dest bi pesnê rêjîma H. Esed kir. Mînak, di rûpela 11an ji hijmara 60î ya heyva Çileya Pêşîn a 1986an de nivîseke qerase li ser rêjîma H. Esed li bin vê sernivîsê hatiye nivîsandin: "Cîyê Sûrî di rûdanên herêmî de: Li hember fişarên zêdebûyî yên emperyalîzmê." (http://serxwebun.org/arsiv/60/). Hêjayî gotinê ye ku di roja newroza 1986an de rêjîma H. Esed newroz qedexe kir. Kurdên li Şamê xwepêşandan çêkirin û berên xwe dan koşka serokkomarîyê. Li wê derê, hêzên ewlekarîyê hemwelatîyê Kurd Suleyman Adî kuşt. Piştî xwîn rijiya, Esed newroz serbest kir. Wê çaxê, PKK daxwuyanîyek da û êrîşî xwepêşandana kurdan kir û xwe li ber dilê rêjîma H. Esed şêrîn kir.

Dema Ocalan hate girtin û revandin, PKKê û Ocalan kesek li vê cîhanê nehiştin ku ew tawanbar nekirin: Çi dewlet bin çi kes bin, ew kirin hevpar û hevbeş û şirîkê "kompiloya navneteweyî", lê bi tenê rêjîma H. Esedê ku peymana Adana di 20/10/1998an de digel Turkan mor kir, Ocalan Esed û rêjîma wî li derveyî "komploya" 15ê Sibata 1999an hişt. Ocalan di 10/10/1998an de ji Şamê derket û şefê îstixbarata leşkerî yê Sûrî general Mustefa Eltajêr weneyekî ji pasporta Ocalan a Qibirsî û sixte da CİAyê û gîhand MİTê jî. Tevî wisa jî, H. Esed û rêjîma wî li derveyî "komploya" li dij Ocalan man. Ne tenê ev jî, PKK û Ocalan H. Esed weke dostê gelê Kurd didît.

Dê berdewam bike.

# Qeyrana Sûrîyê:

# Çareserî an bîreke bêbinî?



Xelkê Reqqa û Minbîcê ji ber şer direvin. 150 hezar penaberên Minbîcî li çolê dijin. Yên Reqqayî heger xizmên wan hebin, xanîyan peyda dikin. Rewşa şênîyên navenda Reqqayê ne diyar e û derbarê rewşa wan a piştî şer de ti tişt nayê gotin.



DERYA KILIÇ

**ZÊDEYÎ** şeş salan di ser şerê navxweyî yê Sûrîyê re derbas bûn. Ji ber şerê wêranker heta niha zêdeyî 500 hezar kesî mirin. Sazîyên mafê mirovan amaje dikin ku herî zêde zarok û jin bûne qurbanîyên şer. Digel wêranîya Sûrîyê, hewlên ji bo "çareserîyê" jî dewam dikin. Piştî serkeftina Esed ya li Helebê, prosesa Astanayê jî dest pê kir. Herî dawî li Astanaya paytextê Qazaxistanê hevdîtina Astana ya sêyem hate lidarxistin. Hevdîtin digel boykota muxalifan di 14-15 Adarê de bi beşdarbûna Wezîrê Derve yê Rûsya, Tirkîye û Îranê; nûnerê Neteyeweyên Yekbûyî yê (NY) Sûrîyê Milos Strugar, nûnerê Sûrîyê yê li NYê Beşşar Caferî û nûnerên Urdûn û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) pêk hat. Hevdîtinê bi serokatîya nûnerê taybet ê Rûsyayê yê Sûrîyeyê Aleksandr Lavrentyev dest pê kir. Hevdîtînan du rojan berdewam kir. Di encama hevdîtîn û gotûbêjên derbarê qeyranê de amaje li ser wê çendê hat kirin ku dê Rûsya, Îran û Tirkîye li agirbestê hûr bibin û dilsozê agirbestê bin.

**Li Humusê şer; li Astanayê boykot**

Bi navbeynkarîya Tirkîye, Rûsya û Îranê di 31ê Kanûna 2016an de agirbest hatibû ragihandin. Lê agirbest bi tevahî nayê cîbicîkirin. Ji alîyekî ve, rejîm û alîgirên Rûsya û Îranê di demên dawî de erîşên xwe yên li derdora Şam û Îdlîbê zêde kirin. Rejîmê di encama erîşan de li Humusê kontrola herêma El Vaerê bi dest xist. Piştre rejîmê û muxalifan li ser derketina ji Humusê li hev kir. Lewre rewşa muxalifên wê derê gelekî xerab e. Ji muxalifan, danûstandkar û Nûnerê Meclîsa Tirkmenên Sûrîyê Muhammed El-Şemam, ji bo Heftenameya Basê axivî û diyar kir ku rejêmê êrîşên xwe zêde kirin û destûr neda ku ti alîkarî bigehêje sivîlan. Ji ber vê yekê, her kes mecbûr dimîne ku ji wan deran derkeve. Di vê çarçoweyê de sivîl dê ji El Vaerê derkevin û biçin Cerablûsê. Ev çûn dê merhele bi merhele pêk bê. Koma yekem dê di 18ê Adarê de derbasî Cerablûsê bibe.

Muxalifên li bakurê Sûrîyê, di medyaya xwe de îddîa kirin ku rejîmê sozên xwe neanîne cî, ji loma ew naçin Astanayê û civînê boykot dikin. Wezîrê Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov, beşdarnebûna muxalifan weke helwesteke bêmentiq nirxand. Nûnerên Sûrîyê ji bo beşdarnebûna muxalifan Tirkîye sûcdar kir. Muxalifên ku Urdûn piştevanîya wan dike, beşdarî civînê bûn. Lê muxalifên bakurê Sûrîyê ku Tirkîye piştevanîya wan dike, ji ber rûdanên dawî yên li Sûrîyê, hevdîtin boykot kirin. Li gor pisporan, sedema vê boykotê pêwendîyên Rûsya û Tirkîyeyê ne. Ji ber ku Minbîc hîn jî ji bo pêwendîyên her du dewlatan kêşe ye. Civîna Antalyayê ku di navbera serfermandarên Tirkîye, Rûsya û DYAyê de hatibû lidarxistin û serdana Serokkomar Recep Tayyip Erdoğan a Rûsyayê ev kêşe çareser nekir; lewre piştî civîna her sê serfermandaran, Rûsya û Amerîkayê leşker li Minbîcê bi cî kirin û rê li ber êrîşên Tirkîyê yên li dijî QSDê girt.

**Encama Astana III**

Wezîrê Derve yê Qazakistanê encama Hevdîtinên Astanayê ragihand û diyar kir ku ev dê ji bo Cenevê amedekarî be. Agirbest bi awayekî xurt dê berdewam bike. Îran jî êdî garantorê agirbestê ye. Hevdîtinên Astana IV dê di 3-4ê Gûlanê de bêne lidarxistin. Lê berîya hevdîtinan, li Tehrana paytextê Îranê, di 17-19 Nîsanê de civîna amedekarîyê dê bê çêkirin. Piştî vê civînê jî, di 23yê Adarê de hevdîtinên Cenevê dê bê lidarxistin.

**Li Astana I û II çê bibû?**

Rejîmê bi alîkarîya Rûsya, Îran û Hizbullahê di kanûna 2016an de kontrola gelek cîhên Helebê bi dest xist. Piştre jî Rûsya, Tirkîyê û Îranê di 20ê Kanûna 2016an de belavokek ragihandin. Di belavokê de hatibû eşkere kirin ku muxalif dê Helebê vala bikin, wekî dî jî agirbest hat qebûl kirin û sepandin.

Li alîyê din, nûnerên muxalifan û rejîmê di civîna yekem a Astanayê de bi temamî li hev nekir. Di 6ê Sibatê de Astana II û di 14-15 Sibatê de jî Astana IIII hate lidarxistin. Di civîna yekem de, ji ber daxwazên muxalifan û rejîmê, peşnûmaya destûra Rûsyayê û xerakirina agirbestê hin alozî derketin. Hevdîtinên Astanayê ji bo Cenevê wek amedekarîyê têne nirxandin. Nûnerên leşkerî yên muxalifan beşdarî Astanayê dibin û yên sîyasî jî beşdarî Ceneve dibin.

Nûnerê Meclîsa Tirkmenên Sûrîyê û danûstandkar Muhammed El-Şemam derbarê Astana û rûdanên Humusê de ji heftenameya Basê axivî.

**"Ji ber ku bawerîya me bi Rûsyayê tune, em beşdarî Astanayê nabin"**

Şemam di destpêka axaftina xwe de derbarê Humusê de axivî û diyar kir ku sivîlên ji Humusê derkevin dê li Cerablûsê bênê bicîkirin. 15-20 hezar sivîl dê derbasî wê derê bibin. Li gor peymanê, di 18ê Adarê de proseya veguhestina wan dest pê bike. Ew bi dilê xwe dernakevin. Ti alîkarî ji bo wan nayê kirin. Heger alîkarî bêne kirin û rejîm û alîgirên wê dev ji bomberdimanan berdin, dê tiştekî bi vî rengî neqewime. Ma kî dixwaze dev ji cihê xwe berde û koçî cîyêkî din bike? Ew ji neçarî koç dikin. Rejîmê di van rojên dawî de êrîşên xwe zêde kirin û li wan herêman rê girtin.

Şemam axaftina xwe wisa domand: "Astana ji bo alîyên leşkerî tê li dar xistin. Alîyên siyasî diçin Cenevê. Nûnerên siyasî û leşkerî biryar dan ku dê beşdar nebin, ji ber ku agirbest nehat cîbicî kirin û li Îdlîb û derdora Şamê êrîşan berdewam kir. Weke ku tê zanîn Rûsya, Astaneyê li dar dixe û ji ber vê yekê muhalifan qebûl nekir ku ew biçin Astanayê. Rûsya biryara NYyê jî veto kir. Dema ku ev rûdan hemû bi hev re bêne nirxandin, em ê çawa bawerîya xwe bi Rûsyayê bînin? Ji ber ku bawerîya me bi Rûsyayê tune ye, em beşdarî Astanayê nabin."

## QEYRANA PENABEREN BERDEWAM DIKE

Penaberî û koçberîya xelkê Sûrîyê jî bûye rojeva sereke ya cîhanê. Li gor rapora Çavdêrîya Sûrîyê ya ji bo Mafên Mirovan ya li Birîtanyayê (SOHR) di nava 6 salan de ji ber şer 465 hezar kes hatine kuştin an jî mirine ku pirranîya wan sîvil in û ew ji alîyê rejîmê ve hatine kuştin. Reuters hejmara mirîyan wekî 320 hezarî dide; herweha li gor UNICEFê di sala 2016an de, li gor 2015an hêjmara zarokên kuştî %20 zêde bûye. 4.8 mîlyon kes li welatên cuda cuda bûne penaber û 6.3 mîlyon kes jî di nav welat de cîhên xwe guhertine.

Li Reqqayê û li Minbîcê, di demên dawîyê de gelek kesan koç kiriye. Li gor zanyarîyên ku heftenameya Basê ji çavkanîyên herêmî bi dest xistine; niştecihên gundên Reqqa û Dêrazorê ku ji DAIŞê hatine rizgarkirin, koçî alîyê Girê Spî û Kobanê dikin. Ti rêxistin alîkarîya wan nake û rewşa wan gelekî xerab e. Lewre DAIŞ destûrê nade ti kes ji Reqqayê derkeve.

Ji alîyê din ve, li gor zanyarîyan rewşa penaberên Minbîcê xerabtir e. Şênîyên Minbîcê ku HSDyê ew radestî rejîmê kirine, direvin û diçin cihên ku di bin kontrola rêveberîya Meclisa Leşkerîya Minbîcê de ne. Lê ew der çol e. Dema xelk ji wan herêman derdikevin, bombeyên ji serdema DAIŞê mane, diteqin û di encama teqînan de gelek kes dimirin.

Serokê Komeleya Dadê Kemal: Heger şerê Reqqayê dest pê bike, dê rewşa sivîlan xerabtir bibe

Serokê Komeleya Dadê ya li Kobanîyê Biradost Kemal, derbarê penaberên Reqqa û Minbîcê de agehîyên dawî dan Basê. Li gor van agehîyan, DAIŞê hemû rê girtine û ti penaber nikare ji Reqqayê derkeve. Şênî nikarin ji hundirê bajarê Reqqayê dernakevin. Ev 6 meh in ku rêyên Reqqayê girtî ne. Heger li navenda Reqqayê şer dest pê bike, rewşa penaberan bi rastî jî dê gelekî xerabtir bibe. Heta niha kes ji wê derê derneketîye û kes nizane niha rewşa wan çi ye. Biradost aşkere kir ku hatina gundewarên Reqqayê ti bandorê li kurdan nake. Ji ber ku ew penaber derbasî gundên ereban dibin.

"150 hezar penaberên Minbîcê hene"

Biradost derbarê penaberên Minbîcê de jî wisa got: "Ji ber rewşa vê dawîyê, gelek penaberên ji Minbîcê hene. Ew niha li çolê dijîn. Dema ku ji gundên xwe derdikevin, bombe diteqin. Li herêmê bombe hene ku ji dema DAIŞê mane. Dema ku DAIŞ derketîye, bombe xistine erdê. Penaber niha li başûrê Minbîcê ne. Ew der çol e û ji bo penaberan pir xerab e. Penaber jî ji ber rejîmê direvin. Rejîm diçe ku derê, xelk jê derê derdikeve. Hejmara wan jî gelekî zêde ye. 150 hezar penaberên Minbîcî hene. Hemû li çolê ne û ti kes alîkarîya wan nake. Penaber tên ber bi hêzên YPGê ve. Lê YPG jî nikarin alîkarîya wan bike.



# Xwekujîya aborî û siyasî ya sivîlan li Rojhilat

**ESKENDER CEIFERÎ**

Tê gotin ku hêzên navbirî di girtîgehan de destdirêjîyê dikine ser wan keçan ku bi sedemên siyasî hatine girtin. Ji ber vê jî, hin keçên kurd piştî ku serbest têne berdan, dawîyê li jîyana xwe tînin da ku navekî xirab nekeve ser wan.

Di demên dawîyê de rêjeya xwekujîyê li rojhilatê Kurdistanê zêde bûye û li gora ku çalakvanên sivîl didin zanîn, rêjeya salane ya xwekujîyê li wir ne kêmtirî rêjeya salane ya darvekirinê ye.

Xwekujî, kiryarek e ku mirov bixwe dawîyê li jîyana xwe tîne. Mirov dikare bêje sedema sereke ya vê kiryarê li hemû civakan bêhêvîbûn e. Xwekuj, ji her çandekê bi her zimanekî û ji her neteweyekê be, digihêje astekê ku li gora wî/wê neman jê re çêtir e ji jîyanê.

Li gora zanyarîyên ji çalakvanên kurd, piranîya wan xwekujîyan ji ber sedemên weke aborî, tûşbûna bi madeyên hişbir û ji ber pirsgirêkên nava malbatê ne.

Herwiha nebûna piştgirîyên alîyên hikûmî ji bo nexweşan jî, sedemeke din a xwekujîyê ye. Bi rengekî ku kesê nexweş, kesekî li derdora xwe nabîne û ji ber nebûna ti piştevanan, yan tûşî nexweşîyeke giran weke şîzofrenîyê tê, yan jî dawîyê li jîyana xwe tîne. Eger bîmeyek tune be ku li pişta nexweşan bisekine, nexweş jî nikare pişta xwe bi kesî germ bike. Li gora bendên cuda yên yasayên parêzvanên mafên mirovan, pêwîst e hikûmet ji bo kesên ku bêkar in yan jî derfeta çareserîya tendirustîyê bi îmkanên xwe nîn e bîmeyan dabîn bike û xerca tendirustîyê û jîyanê bikşîne.

Eger kerameta mirovan ji hikûmetan re girîngtir be, divê kesekî sivîl nikaribe bi hêsanî çek û sîlehan bi dest bixîne. Hebûna çek û sîlahan di civakekê de dikare fikra tundrew li pey xwe ve bîne. Eger salane 500 welatîyên kurd ji alîyê wezareta Dadê ya Komara Îslamî ya Îranê ve tenê darvekirin, zêdetirî 500 kesî jî dawîyê li jîyana xwe tînin. Hebûna hebên naskirî bi birinc û sîyanor jî dikare rê li ber xwekujîyê veke. Ew kîjan dermangeh e ku li Îranê, bêyî biryara bijîşkan, heban nefiroşe!

Salane ji 800 hezar kesî heta milyonek kesî li hemû cîhanê bi şêwazên curbicur dawîyê li jîyana xwe tînin.

Rêkar û rênimûnên ayînî, dema ku tev li sîyasetê dibin, fikra mirovan jî diguherin. Li gora ola Îbrahîm, jîyan tiştek pîroz e lê xwekujî jî gelek mezmûm nîn e. Japonî jî xwekujîyê weke qerebûya pêşîneya xirab dibînin. Li Hindistanê jî jina ku zilamê wê dimire, dikarî xwe bavêje ser agirê ku laşê zilam pê dişewtînin û ew jî dawîyê li jîyana xwe bîne. Perwerdekirina zarokan li gora fikrên qedîm jî dikare sedemeke din a xwekujîyê be. Hin ji wan kesên ku bi vî rengî têne perwerdekirin, rastî grûbên tundrew tên û xwe di berjewendîya wan de dikujin. Lê li rojhilatê Kurdistanê asta bilnd a xwekujîya ji ber sedemên sîyasî û aborî, vê şêwaza xwekujîyê vedişêre.

Li gelek ji welatên Rojava, êdî xwekujîyan hewla xwekujîyê weke tawan nayê hesibandin. Lêbelê divê ji bîr nekin ku asta jîyana xelkê li welatên Rojava eger gelek jî baş nebe, lê hêjayî kerameta mirovan e.

Li hin welatan şêwazeke xwekujîyê bi navê xwekujîya alîkar heye. Hin çalakvan dibêjin hikûmeta Îranê jî bi kiryarên xwe yên aborî û siyasî bûye alîkara xwekujîyê ji bo qurbanîyên wê. Êdî li hin welatan şêwirmendên xwekujîyê jî hene. Hêsantirîn rê ji bo xwekujîyê nîşanî xelkê didin. Lêbelê bi ti awayekî mirov nikare Îranê û rojhilatê Kurdistanê bi welatên Rojava re deyne ber hev. Nirxandina civakekê bi civakên din re, tenê di demekê de çê dibe ku asta jîyana welatîyên wan jî weke hev be.

**Sedema xwekujîya li Rojhilat siyasî ye**

Hin siyasîyên Îranê pêşnîyaz dikin ku ew kesên xwekujîyê dikin, ji merasîma veşartina term di qebristanên gund û bajaran de bêne bêparkirin. Lê belê wan ji bîr kirîye ku divê çavkanîya xwekujîyê bê hişkkirin. Mentiqa wan kesan Atêna berê ya Yewnanistanê ye ku kesên bêyî erêkirina hikûmetê dawîyê li jîyana xwe tînin, ji binaxkirina di goristanan de têne bêparkirin û bê navûnîşan li derveyî goristanan têne binaxkirin. Dibe ku ew kiryar jî bikarin meyl û heza xelkê ji bo xwekujîyê kêm bikin. Lê disa jî nabe hikûmet ewqasî xemsar be ku li dewsa zuhakirina çavkanîyê, qurbanîyan bi tawanbar bizane yan jî piştî xwekujîyê, hikûmet dest deyne ser milk û malên wî/wê.

Desthilata ku herî zêde bi şêweyeke radîkal li hemberî vê mijarê derdiket, Brîtanya ye. Di sedsala 19an de eger li ser kesekî/ê bihata îsbatkirin ku hewla xwekujîyê daye, ew kes dihate darvekirin. Mentiqa wan desthilatan ji bo îdamkirina kesên ku dest davêjin xwekujîyê ew bû ku tirsek li cem xelkê çê bibe û li encama xwekujîyê bifikirin.

Çendîn caran heta niha li rojhilatê Kurdistanê bûyerên bi vî rengî derketine ku keçek ji alîyê sazîyên ewlehî ve tê girtin. Tê gotin ku hêzên navbirî di girtîgehan de destdirêjîyê dikine ser wan keçan ku bi sedemên sîyasî hatine girtin. Ji ber vê jî, hin keçên kurd piştî ku serbest têne berdan, dawîyê li jîyana xwe tînin da ku navekî xirab nekeve ser wan.

Hin siyasîyên nêzîkî Mihemedê Xatemî li Îranê behsa yasayîkirina xwekujîyê kiribûn. Lê berî ku bibe mijara ragihandinê, ew hate bêdengkirin. Li gora wan kesan, divîyabû kesên ku dixwazin dawîyê li jîyana xwe bînin, sedemên baş ji bo vê biryarê bînin û endamên laşê xwe jî pêşkêş bikin. Li Amerîkayê ji sala 2008an ve li 16 navçeyan derfeta xwekujîyê bi şêweyekî fermî heye û belkî çavên wan jî li Amerîkayê bin.

---



**EKREM ÖNEN**

## Wergera pirtûk û dokumentên di zimanê tirkî de cihê bawerîyê ye?

Berîya demekê li Stockholmê em çûm bîbloteke, pirtûkên ku me wergirtibûn bi paş de bidin û hinek pirtûkên nuh werbigirin. Pirtûkên me wergirtibûn bêhtir bi rûsî û swêdî bûn, paşê me bala xwe da pirtûkan ji bo ku em hinek pirtûk werbigirin. Ez sirreke xwe eşkere bikim ku ez bi tirkî pir kêm dixwînim û dinivîsim (bêhtir rûsî, kurdî û swêdî dixwînim). Lê dema li bîblotekê min bala xwe da beşa zimanan, beşa tirkî jî ber bi çavê min ket, min lê temaşe kir, li wir pirtûka Dostoyevskî a bi navê "Birayên Karamazov" ber bi çavê min ket, tevî ku ev pirtûk berê min du caran bi rûsî bi zimanê orîjînal xwendibû (carekê ji bo dersa edebîyata rûsî dema min li unîversîteyê xwendibû û carekê jî ez li rûsya çûbûm tetîlê, ser behra reş Soçî, min li wir xwendibû.) Min ji kitêbxanê rahişt wergera wê ya bi tirkî. Min pirtûk anî, li malê min dest pê kir û xwend. Gelek xerîb e dema mirov pirtûkekê bi zimanê orîjînal xwendibe paşê wergerê dixwîne. Ez hinekî bi nav pirtûkê de çûm, bi min wer dihat ku gelek tiştên di orîjînalê de heye di vê pirtûkê de nîne. Herweha tahma orîjînal nade mirov. Lê ji bo orîjînala wê min ji zû de xwendibû pir zelal nedihate bîra min.

Min ewqas cidî negirt, paşê hinekî din pê de çûm, hinek tişt ji pirtûkê hebûn ku baş di bîra min de mabûn: Dostoyevskî di pirtûka orîjînal de behsa zulma tirkan a li hember xelkê sivîl dike. Min pirtûk xelas kir lê ez gelekî ji pirtûkê bi şik bûm ku ne normal hatîye wergerandin. Paşê em çûn me li rûsî nêrî ku erê di wergera tirkî de ew cihê behsa zulma tirkan dike, çend rûpel e û hîç wernegerandine. Min got belkî tirkan pirtûk ne ji orîjînalê wê ango ji rûsî lê ji înglîzî wergerandibe, me li a înglîzî nêrî, wek orîjînalê wê wergerandine, me li ya swêdî jî nêrî ew jî wek orîjînalê wê hatîye wergerandin. Me fam kir ku bi tenê tirkan werger sansur kiriye û beşek ji pirtûkê wernegerandiye.

Piştî min hinekî lekolîn kir, derket ortê ku 13 weşanxaneyan ev pirtûk bi sansur wergerandiye û çap kiriye. Tişta herî xerîb ew e, edîtorîya yek ji van wergeran, nivîskarê tirk ye xwedîyê xelata Nobelê Orhan Pamuk e. Tevî ku Orhan Pamuk bi înglîzî baş dizane û pir rehet dikarîbû ev sansur bidîta, wî çima nedîtîye? Diyar e wergera pirtûk û dokumentan di bin kontrola zexm a dezgehên dewleta tirk de tê kirin. Di pirtûka Dostoyevski ya "Birayên Karamazov" de cihê ku Dostoyevskî li ser zilma tirkan nivîsîye gelek e, lê ez ê ji pirtûka bi zimanê orîjînal rûsî epîzodeke biçûk bidim ku di wergera tirkî de nîne û hatîye sansur kirin. Da ku ji bo we eşkere be ku di tirkî de werger çiqas ne cihê bawerîyê ye. Heta bi çapxaneya tirkan jî wek qorsanan kar dikin. Ji ber ku li cîhanê qanûnên navneteweyî yên çapxana Kopiraid heye, lê diyar e tirk li tu qanûnan napirsin. Ev ji rûpelê 48an a pirtûka Dostoyevskî F.M. Brayên Karamazov e. Ev tirk ji zulma li zarokan dikin zewqê distînin, bi xencerê şerjêkirina (kuştin E.Ö) û derxistina zarokan ji rehmê (zikê) diya wan, heta li ber çavê diya wan zarokên li ser qûndaxê (qundaxa tivingê E.Ö.) davêjin hewa (bilind dikin E.Ö.) û bi serê singûyê digirin, her tiştî dikin. Tişta herî jê zewqê distînin, dema van tiştana tevan li ber çavê dîya wan dikin. Dostoyevskî F.M.- Birayên Karamazov ( Братья Карамазовы). Rupel 48


Ev sansura tirkan min di dokumentên dirokî de jî dîtîye ku tirk çawa dokumentên li ser kurdan ên bi rûsî an jî înglîzî tehrîf û sansur kirine. Gelek caran di dokumentên dîrokî de gotinekê diguherin ku ew gotin temamê maneya dokumentê diguhere, ji ber vê divê di bikaranîna dokumentên tirkî de kurd gelekî lê miqate bin. Mînakek din ku hinek "musilmanên" tirk (tirk-îslam sentezî) ku xwe "Nurcî" dihesibînin, hemû berhemên Seîdê Nûrsî çap kiribûn. Paşê dezgeha Nûbiharê mala wan ava be, pê hesiyan ku gelek tehrîf hatîye kirin ji nû ve wek orîjînal çap kirin. Divê kurd ji her tiştê tirkan ku li ser kurdan wergerandine û çap kirine bi şik binêrin û pişta xwe medin rastîya wê.

Gelek caran ez bi dostên xwe yê nivîskar û lêkolînvanê kurd re sohbetê dikim û dibêjim wergeran ji wergerên tirkan mekin, heta ji we tê ji zimanê orîjînal an jî ji zimanekî din bikin ku relativ dikare objektiv be. Kopîkirin her xerab e, kopîkirina tirkan di cîhanê de a herî xerab e.

Herweha di warê medyayê de jî dezînformasyon û manîpulasyon karê medya tirkan e. Diyar e dewleta tirk ev kar bi deh salan e gelekî lê miqate bûne, bi taybet ji bo kurdan manîpule bikin û wan ji rastîyê bi dur xin. Ev manîpulasyon, tehrîf û sansur tev ji bo ku kurd di prîzma tirkan de helwestê bigirin û wek mînak nêrîna wan a li hember DYA, Rûsya; welatên Ewrûpî, yûnanan, ereban û hwd. di prîzma tirkan de binêrin. Ji ber wê, gelekî grîng e ku bi tevayî kurd û bi taybet nivîskar, lêkolînvan û siyasetvanê kurd li vê miqate bin. An na mirov manîpule dibe û dibe xwedîyê helwestên şaş. Divê kurd li her tiştê tirkan bi şik binêrin ku derbarê kurdan de ne. Dewleta tirk bi salan ev tiştana bi awayekî sîstematîk dikin ji bo bikaribin kurdan di bin hişmendîya wan de êsîr bigirin.

## Referandûm:

# Ne xelk partîyên siyasî li qada ne



Pispor jî destnîşan dikin ku dê dengê kurdan tesîrê li encamên referandûmê bike. Li alîyê din jî nebûna eleqe û germahîya kurdan bo referandûmê jî tê nîqaş kirin.



NÛJÎN ONEN

XEBATÊN partîyên siyasî bo giştpirsîya 16ê Nîsanê dewam dikin. Li kuçe û kolanan bakurê Kurdistanê ti kelecan û germahî referandûmê nayê dîtin. Ji ber rewşa awarte û girtinan endam û hevserokên xwe Partîya Demokratîk a Gelan (HDP) zêde nikare derkeve qadan. Partîyên din ê kurd weke PAK, PDK – Bakur, PDK – T jî aşkere kirin ew dê neçin ser sindoqan û referandûmê boykot bikin.

Herwiha pispor jî destnîşan dikin ku dê dengê kurdan tesîrê li encamên referandumê bike. Li alîyê din jî nebûna eleqe û germahîya kurdan bo referandûmê jî tê nîqaş kirin.

Serokê Partîya Komarî ya Gel (CHP) Kemal Kılıçdaroğlu, Serokwezîr û Serokê Partîya Dad û Geşedanê (AKP) Binali Yıldırım, Serokê Partîya Hereketa Neteweperest (MHP) Devlet Bahçeli derketine qadan û bangeşeya partîyên xwe bi rayagiştî ya Tirkîyê re par vedikin. Digel serokên partîyan û parlementerên wan Serokkomar Recep Tayyip Erdoğan jî zêdetir ji du hefteyane derdikeve qadên bajaran û mîtîngan saz dike. Tê çaverêkirin Serokkomar û Serokwezîr jî di serê meha nîsanê de bên Amedê û li Amedê mitingekê saz bikin.

CHP – HDP aşkere dikin ew dê bêjin na û pêşnimaya destûrê ya AKPê û MHPê amadekirine dê îstîkrara sîyasî ya Tirkîyê têk bide. Herwiha li beramber MHP – AKP jî balê dikşînin ser wê çendê û aşkere dikin bi guherîna destûrê re û bi sîstema nû ya hikûmetê re dê îstikrara siyasî seqamgîr bibe.

Nûnerê şîrketa ankêtan A&G Adil Gür aşkere dikin ku dê ji sedî 54ê xelkê bêjin "erê" û dê ji sedî 46ê xelkê jî bêjin "na". Herwiha Navenda Lêkolînan Rayagiştî ya Avrasyayê jî radigihînin ku dê ji sedî 57ê xelkê bêjin, "na" û dê ji sedî 42ê xelkê jî bêjin "ere".

Parlementerê HDPê yê Amedê Îmam Taşçier liser guherîna xalên destûrê dibêje;" Heger di van guhertinan de ji bo dayîna mafê kurdan gavek hatiba avêtin ji bo demokrasî li Tirkiyê binecîh bibûya hewlek hebûya dê me jî bigota; "erê". Parlementerê CHPê yê Stenbolê Sezgin Tanrıkulu jî dibêje '' Destûr di rewşên demokratîk û aştiyê de tê çêkirin,di rewşên awarte de maf û azadiyên bingehîn tên bin pê kirin û nabe ew destûr pêk were." Parlementerê AKPê yê berê Cuma İçten jî dibêje, guhertinên destûrêbo parastin û mukumkirina îstîqrarê tên kirin.

Şîrketa ankêtan A&G Adil Gür aşkere dikin ku dê ji sedî 54ê xelkê bêjin "erê" û dê ji sedî 46ê xelkê jî bêjin "na". Herwiha Navenda Lêkolînan Rayagiştî ya Avrasyayê jî radigihînin ku dê ji sedî 57ê xelkê bêjin "na" û dê ji sedî 42yê xelkê jî bêjin "erê".

### Parlementerê CHPê Sezgin Tanrıkulu: Bila kurd biçin ser sindoqan

Parlementerê Partiya Komariya Gel CHPê yê Stenbolê Sezgin Tanrıkulu liser guherînên destûrê dibêje; nabe destûr li gor partiyek siyasî an li gor aktorên siyasî bê çêkirin. Destûr li gor pêdiviyên civaka û bi mutabakat û lihevkirinan tê çêkirin. Ev yek li cîhanê wiha ye, divê li Tirkiye yê jî wiha be û wiha berdewam dike. Ew destûra ne li gor pêdiviyên Tirkiye li gor roveja partiyên siyasî hatiye rojevê ji ber wê ev yek dê civakê ji azadî ,wekhevî û dadê herwiha dê ji dûrî rêveberiyek zelal be û dê pêdiviyên Tirkiye neyîne cîh û dê Tirkiye ji demokrasiyê dûr bixe. Destûr di rewşên demokratîk û aştiyê de têne çêkirin,di rewşên awarte maf û azadiyên bingehîn tên bin pê kirin û azadiya ramanan tune dike herwiha azadiya kombûnê an medyayê jî ne mimkin e di rewşek wiha de nîqaşên liser destûrê jî ne zêde ne.

Parlementer Sezgin Tanrıkulu balê dikşîne ser vê yekê û dibêje; "Ti gotinek Partiya Dad û Geşedanê û Erdoğan ji bo kurdan der heqê referandumê de tuneye. Polîtîkayên wan ya piştî 7ê Hezîranê li ser esasê tunehesibandina kurdan e û çareserîyê jî di nava xwe de nahewîne. Ji ber wê bi Partiya Neteweperest re bi stratejiyekê li ser tunehesibandina kurdan kar dike." Tanrıkulu rexneyan li siyaseta xendekan jî digre û wiha diaxive; "Xendek û barîkat tiştên çewt bûn heta dawî em li hember vê yekê derketin. Divê piştî 7 Hezîranê rewşek weke tundî û pevçûnên nav bajaran tunebûya lê ev yek ji xwe re kirin hêncet sîyasetek demokratîk û daxwazên kurdan bi temamî tune kirin. Bajar û mirovên me bi wêraniyek mezin rû bi rû man. Ti gotinek AKPê û Erdoğan ji kurdan re tuneye û ti hêvîya wan ji kurdên ku wêraniyek û travmayek mezin derbaskiriye tuneye. Lê ji bo kurdan 2 wateyên vê referandumê hene ji bo îradeya bi hevdura jîyanê û jiyanek hevpar nîşan bidin divê kurd biçin ser sindoqan.

### Parlementerê berê yê AKPê Cuma İçten: Pirsa kurdî çareser bûye

Parlementerê Partiya Dad û Geşedanê yê berê Cuma İçten jî aşkere dike hikûmet bi pêşnimaya destûrê hewl dide millet biparêze ji lewre destûreke nû tê amade kirin. Ji aliyê din jî ve İçten destnîşanîyê bi hewla derbeyê ya 15ê Tîrmehê dike û wiha berdewam dike: "Piştî hewla derbeya 15ê Tîrmehê li hemû Tirkiyê rewşa awarte hat ilan kirin û cûdahiya rewşa awarte ya niha heye helwêstek wiha heye millet li hember dewletê tê parastin,berê berovajî wê bû millet ji dewletê dihat parastin. Li gor min; di nav 18 maddeyan de xala herî girîng mahkemeyên leşkerî dê bi giştî bên rakirin û li cîhekî tenê dê kom bibe, mahkemeyên sîvîl jî dê bên çêkirin. Herwiha dê leşker jî ji aliyê dadgehên sîvîl bên darizandin."

Cuma İçten liser çareserîua pirsa kurdî jî dibêje; "Wek kurdekî ez dikarim bibêjim li erdnîgariya me ez di vê fikrê de me ku pirsgirêka kurdî çareser bûye. Berê min nedikarî ku ez bi zazakî û kurmancî biaxivim. Lê niha li dibistanên dewletê min mafê perwerdehiya kurmancî û zazakî bidest xistibe û liber astengîyên li hember demokrasî û azadiya mafên kurdan hemû hatibin rakirin êdî ew pirs çareser bûye. Piştî 7 Hezîranê herêmên ku HDP lê xurt bûn xendek hat kolandin bi deh hezar kes nedikarîbûn biçin malên xwe. Kesên ku ev zilm kirin dewelet bû an PKK bû an HDP bû. Kesên ku ev zilm kir ne dewlet bû,şaredariyên HDPê û siyasetmedarên wan bûn. Li gor min pêvajoya çareseriyê bi awayekî xurt berdewam dike lê bi mixtaran,saziyên sîvîl gelên herêmê û kesên siyaseta cûda dikin. Bila ti kes PKK û HDPê weke muxatabê pêvajoya çareseriyê nebîne. Heger pêvajoya çareseriyê dê bi PKK re bê axaftin ev ji xwe xelas bûye. Ji bo pêşketina welat em dibêjin ya bi xêr erê ye lê heger na derkeve erê çiqas bi qiymet be dê na jî ewqasî bi qiymet be. Îradeya millet liser sindoqan çibe dê kesên siyasetê dikin rêzê li wê îradeyê bigrin.





Sezgin Tanrıkulu



Cuma İçten

## PARLEMENTERÊ HDPÊ İMAM TAŞÇIER: EM DESTÛRA DERBEYÊ NAXWAZIN

Parlementerê HDPê yê Amedê İmam Taşçıer liser xebatên giştpirsiyê axivî û diyar kir ku ku destûra niha di 12 Îlonê de ji aliyê Kenan Evren hatiye çêkirin û destûreke serdema dîktatoriyê ye û dibêje, ji bo ev destûra bê guhertin jî çend caran guhertin çêbûne. Di 18 xalên ku hikûmet dixwaze biguherîne de mukumkirina hiqûq û demokrasî tuneye,di yek xalê jî de ji bo mafê gelê kurd û ji bo çareseriya pirsgirêka kurd, gav nehatîyê avêtin û bingeha vê yekê tuneye. Herwiah Taşçıer dibêje; heger di vê giştpirsiyê de erê derkeve ew kesên ku dibêjin erê di heman wextê ji destûra 12 Îlonê jî dibêjin erê û wiha diaxive: "Di nav van xalan de guhertineke pozîtîf tuneye zêdetir ew statukoya ku heyî dê berdewam bike. CHPe jî biryara xwe ya xwe liser vê statûkoyê avakiriye. Em statukoya 93 salan e naxwazin û ya 12 îlonê jî naxwazin."

Parlementerê HDPê yê Amedê balê dikşîne ser sîstema serokatiyê û dibêje; di nav van 18 xalan de behsa sîstema serokatiyê jî tê kirin lê behskirina serokatiyê ne wekî normên Ewropa, dinyayê, hiqûqa navneteweyî ye. Serokatiya ku tê xwestin wek serokatiyeke Rojhilata Navîn e. Parlemento, hikûmet, hiqûq tê de tune ye. Di vir de hemû tiştî dê serok îdare bike kê bixwaze dê wî bike, wezîr, cîhgir û rêvebir. Heger di van guhertinan de ji bo mafê kurdan gavek hebûya ji bo demokrasî were Tirkiyê tiştek hebûya pêşiya demokrasîyê vekirina çima em nebêjin erê? Lê di vir yek ji van tiştan jî em nabînin. Ew kesên ku dê bibêjin erê yek jî jê nizanin çi di destûrê de hatiye guhertin. Guhertinek e esasî di vir de heye, guhertinek wiha heye ku hikmê kesekî liser temamê gelê kurd û tirkî çêdibe. Ev şaredar û parlementer û hevserokên bêsûç bêsebeb hatine girtin dizî nekirine malê ti kesî nebirine bêhiqûqî nekirine. Heger mirov ji guherîna destûrê bibêje erê,ev tê vê maneyê ku mirov ji vana jî dibêje erê. Armanca girtina hevserok,hevşaredar,parlementer û endamên partiya ev e ku dizanin kurd dê bibêjin na."

Taşçıer liser xebatan dibêje li gor hilbijartinên 7 Hezîranê û 1ê Mijdarê referandum ne bi denge lê dîsa jî xebatên wan baş diçin û wiha berdewam dike: "Kêmasiyên me hene, lê gel li xebatan xwedî derdikevin û her kes ji aliyê xwe xebatan didomînin. Belkî weke berê nepir bi deng e ew jî ji ber rewşa awarte ye. Em nikarin li her kolanekê daxuyaniyekê bidin,dema em bi gel re xebatan dikin gel jî aciz dikin,dema rewş wiha be her kes diçin malên xwe û li wir xebatan didomînin ji ber wê dibe ku li gor 7 Hezîranê ne bi deng be lê xebatek zêde heye. Ez wisa bawerim ew ê li Kurdistanê li bajarê kurdan çawa di 7ê Hezîranê û 1ê Mijdarê deng da ne HDPê ew ê ji wê çaxê zêdetir deng hebe ne kêmtir."

# Bazara Penêr a Sûrê hîn jî bi ser xwe ve nehatîyê

**DILŞAH AMEDÎ**

**BAZARA** Penêr a li Sûra navçeya Amedê, li ser rêya kevin a Mêrdînê û Balıkçılarbaşı ye. Ev bazar cihêkî xwe yê dîrokî heye. Bazara Penêr li bakurê Kurdistanê û li derveyê welêt gelekî navdar e. Hemû curê penêrê Amedê, mast, zeytûn û hingiv li vê derê têne firotin. Li vê derê penêrê Qerecdax, Erxenî, Hênê, Şemrex, Farqîn û Mêrdînê peyde dibe. Ji loma, ji her derê xirîdarên vê bazarê hebûn, heta ji derveyê welat jî.

Gundîyên hawidorê penêrên xwe bi piranî dianîn vê bazarê. Ji vê derê jî ew penêr dişandin bajarên din û derveyê welêt. Lê serê salekê ye ev bazar ber bi girtinê ve diçe. Rewşa bazirganên wê gelekî xerab e. Bazirgan ji ber bazara mirî gilî û gazinên xwe dikin.

Salek berê li Sûrê şer derketibû û navçe hatibû qedexirin. Wê çaxê, ji ber rûdanan dikan hatibûn girtin û ti kesî jî nikaribû biçe Sûrê û ji Bazara Penêr danûstendinê bike. Piştî rûdanên Sûrê gelek bazirganan dikanên xwe yên Sûrê girtin û çûn cihekî din dikan vekirin. Hejmara dikanên bazarê ji 74an daketîye 15an. Dema ku mirov dikeve nava bazarê, dezge û dikanên vala bala mirov dikşînin.

Derbarê rewşa xirab a bazarê de bazirgan bi heftanamaya Basê re axivîn û diyar kirin ku ne bi qasî par e lê dîsa jî rewşa wan gelekî xirab e û ew li bende alîkarîyê ne. Heger wisa berdewam bike, bazar dê nemîne.

Bazirganên Bazara Penêr Zeki Temel, Mehmet Aras, Mehmet İşçi ve Abdülkadir Bitmiş rewşa niha ya bazarê û ya berê ji Basê re da ber hev û derbarê rewşa xwe de axivîn.

**Bazirgan Zeki Temel: Berî rûdanan 74 dikan li vê derê hebûn, lê niha bi tenê 15 dikan hene**

Zeki Temel ji Şemrexa Mêrdînê ye û bû 19 sal e li Bazara Penêr bazirganîyê dike. Ew penêr, zeytûn û rûn difroşe. Ew û birayên xwe bi hev re li vê derê dixebitin.

Temel derbarê peynîrê vê salê de diyar kir ku berê penêrê Amedê pir bû û baş derdiket. Lê îsal penêr wek berê baş dernakeve. Lê ji bo destpêkê gelekî baş e. Yê helandî bi 15 lîreyan e û yê kesidandî bi 8an e. Gava penêr derdikeve tê bazarê, nasekine, tê firotin. Penêr dihere derveyî bajêr û welatên din jî. Berê hundirê Sûrê gelekî xweş û şên bû. Di vê wexta xwe de ev der gelekî qalabalix dibû, carna bi hezaran kes li hev dicivîyan.

Li gora bazirgan Zeki Temel berî rûdanan 74 dikkan li vê derê hebûn lê niha bi tenê 15 dikan hene. Piştî bûyeran hemû kes ji vê derê derketin û çûn deverên din. Dikandarên me çûn li Diclekent, Rezan û Yenişehirê dikan vekirin. Li her derê bajêr dikan vekirin. Dema yek biçe û li cihekî din cihê karê xwe veke, ew êdî venagere; çûye ji xwe re dikan kirê kiriye, ew der êdî cîûwarê wî ye. Lê ji alîyekî ve aniha li Sûrê ti kes nemaye.

Temel derbarê penêr û cihên ku jê tê jî zanyarîyan dide me û dibêje: "Ji Mêrdîn, Qerecdax, Erxenî, Hênê, Şemrex û Farqînê, ji hemû navçeyên Amedê rûn, penêr û zeytûn dihatin. Xelk ji wan deran dihatin, malê xwe difirotin û diçûn. Lê piştî ku ev bûyer pêk hatin, êdî gelek kesan dev ji vê derê berdan û xirîdarên xwe êdî ji derveyê Sûrê peyde kirin û dest bi firotinê kirin."

Zeki Temel careke dî bal kişand ser rewşa berê ya bazarê û da zanîn ku di biharê de ev der gelekî qelebalix bû. Penêr dihat kirîn û firotin. Ji vê derê penêr diçû derveyê bajêr û welêt. Bo nimûne, ji Fransa û Hollandê mişterîyên bazarê hebûn. Ji bo penêrê me dihatin heta vir, penêr distendin û diçûn. Hezar erebe ji gundan dihatin vê derê û wexta dihatin vê derê bi kêmanî zeytûn, penêr an jî hingiv distendin.

Temel li ser îddîayên girtina bazarê, çend caran çûye cem rayedarên bajêr. Ew dibêje: "Wan ji me re got: 'Em ê bazarê xera nekin. Em destûrê nadin ti tişt pê bê. Ev der dê berdewam bike. Lê em dê bên dikanên wê hemûyan restore bikin, nû bikin.' Em jî niha li bende wan in. Ji bo vê derê heta niha ti tişt nehatiye kirin. Kî çi dike bi îmkanên xwe dike. Ji bilî vê, ti alîkarî yan derfeteke nû tune ye.

Temel derheqê girtina dikan û danûstendina kêm de jî axivî û aşkere kir ku hêdî hêdî dikan têne girtin. Ji ber kar nabe, bazirgan dikkanên xwe digirin û diçin. Hinek dibêjin dê hemû dikan bêne xerakirin hin kes jî dibêjin na, ev bazar dê neyê girtin. Bûyerên mezin li vê derê qewimîn. Tanq û top û sileh hebûn. Kes newêribû were vê derê û tiştekî bistîne.

**Bazirgan Mehmet Aras: Piştî şerê Sûrê firotina penêr ji sedî 90 kêm bûye**

Mehmet Aras ev 23 sal e dikana wî li bazarê ye û bazirganîyê dike. Aras bi eslê xwe ji omerîyên Merdînê ye. Ew di serê axaftina xwe de behsa rewşa penêr dike û dibêje danûstendina penêr wekî berê nîne, ji sedî 80yê penêrê niha ji derveyê bajêr tê, ji Mereş û Dîlokê tê.

Aras jî rewşa xwe ya berî rûdanên Sûrê û a niha berawird kir û got: "Piştî şerê Sûrê firotina penêr ji sedî 90 kêm bûye. Xirîdarên me yên nas, ji ber xatir û hevaltîyê tên 4-5 kîloyan ji me dikirin. Berî şer ev der gelekî baş bû. Min berî şer 300-350 dimbo penêr difirotin. Rojin hebûn min 6-7 ton peynîr ji gundîyan distand. Min dişand Elezîz û Erzîncanê. Lê niha heta vê saetê min perçeyek bi tenê penêr nefirotiye. Me gelek ked daye vê derê. Cihekî din tune ye ku em biçin. Em jî sebra Xwedê dikşînin. Tişekî em bikin tune ye."

Aras aşkere kir ku heger Sûr ji nû ve bê avakirin û tirs tune be, dibe ku dîsa ev der şên bibe. Heger ev der di nava 2-3 salan de xweş bibe, ez ê li vê derê berdewam bikim; heke na, ez ê ji bo zarokan berê xwe bidim cihekî din.

**Bazirgan Mehmet İşçi: Kes li vir ne miqate ye û haya kesî ji me tune ye**

Mehmet İşçi ji Sûra Amedê ye, ew û birayên xwe bazirganîyê dikin. Berîya şer li Sûrê xanîyê wan jî hebûye lê ji ber ku hilweşîyaye, ew firotine. Rojê 50-100 lîreyî qezenc dike û bi vî awayî debara 8 kesan dike.

İşçi axaftina xwe wisa domand: "Kar tune ye. Ev der hatiye girtin. Kes li vir ne miqate ye û haya kesî ji me tune ye. Xirîdar nayên. Dewletê soz da me ku alîkarîya me bike, lê nake. Em ji sibêhê heta evarê bi zorê 50-100 lîreyî qezenc dikin. Ne şeradar, ne qeymaqam û ne jî serokwezîr, ti rayedar nayê û li halê me napirse. Heger bê jî heta Mizgefta Mezin yan jî Balıkçılarbaşı tê, ewqas."

Mehmet İşçi dîsa bal kişand ser helwesta dewletê û diyar kir ku dewlet dibêje; "Em ê alîkarîya we bikin û 50 hezar lîre pere bidin we." Lê ew jî kefîlan dixwazin. Heger kefîlê min hebe, ez ê çima destê xwe li ber wan vekim? Ez ê ji ku derê 2 kefîlan ji wê re bînim. Îro bav û law û bira nabin kefîlên hev. Carna dibêjin em ê vir bigirin. Carna dibêjin na, em ê negirin. Ka em ê çi bikin?"

İşçi gilî û gazinên xwe yên derbarê kurdan de jî ragihand û wisa pê de çû: "Îro em dibêjin em kurmanc in. Lê eleqeya me bi kurmancan û kurmancî tune ye. Eleqeya me ya xwişk û biratîyê bi hev tune ye. Kesên ku li derveyê Sûrê dijîn, nayên Sûrê û danûstendinê nakin. Însanên me dibêjin bila wereqeyek duduyê wê zêde be, lê em ji ber derîyê xwe bikirin."

İşçi wekî din jî bal kişand ser derfetên kar, kêşeyên civakî û da zanîn ku nava hefteyê 7-8 diz ketine dikanan. Dewlet jî li vê derê heye. Dewlet çi ye? Xema dewletê nîne. Dewlet ketiye derdê Sûrîyê û bêrîka xwe. Heger kar, debar û îmkan tune bin, xelk dê dizîyê bike. Ji ber ku ti çareya wan tune ye ew vî tiştî dikin. Dewlet fabrîkayan li Amedê çê nake. Dibêje PKK nahêle. De ka tu were, çê bike. Em dê bibînin PKK dihêle yan na.

İşçi di dawîya axaftina xwe de wisa got: "Rewşa me ya berîya bûyerên Sûrê gelekî baş bû. Kolanên Sûrê tije bûn."



Bazara Penêr a Sûra Amedê piştî bûyerên Sûrê hîn jî bi ser hev de nehatîye. Rewşa bazarê û bazirganan xerab e. Bazirgan yek bi yek dikanên xwe vala dikin. Ji 74 dikkanan bi tenê 15 heb mane. Heke wisa biçe Bazara Penêr dê nemîne.



Mehmet Aras



Mehmet İşçi



## BAZIRGAN ABDÜLKADİR BİTMİŞ: BANDORA PAR BERDEWAM DIKE

Abdülkadir Bitmiş di destpêka axaftina xwe de xwe dide nasîn û dibêje: "Ev bû 20 sal, ez vî karî dikim. Buhaya şîr giran e yê penêr kem e bi 13-14 lîreyan e. Niha em nikarin ti tiştî bifiroşin. Xelk nayê vê derê û ti tiştî nakire."

Bitmiş jî ji ber rewşê gelekî bi gazin e û diyar dike heta bûyeran danûstendin û bazar pir baş bû. Lê niha gelekî xerab e lewre bandora par berdewam dike. Dihat gotin dewlet dê 50 hezar lîreyî bide dikandaran. Lê me heta niha tiştek nedîtiye, gelek hincetan derdixînin. Bo nimûne, deynê we li bankayê heye û we deynê xwe nedaye, radibin kefîl û tapûyekê dixwazin. Ji 100 bazirganî 90î nikarîbû van şert û mercan bîne cih.

Bitmiş di berdewamîya axaftina xwe de behsa bêçaretîya xwe dike: "Em nikarin ti tiştî bikin, vir milkê me ye. Heger me kirêdar peyda bikira, me ji zû de dabû kirê û em derketibûn. Par vê çaxê ji ber qedexeyan dikan girtibûn. Piştî qedexeyan, îcar jî rê girtin. Me par ti kar nekiri, hêvîya me ew e îsal baştir be."





## Bihar û biharîye:

# Di edebîyata kurdî ya klasîk de

Siruşta biharê ji helbestvan re dibe mecalek ku hunera xwe ya bilind derxe meydanê û hêza xwe ya helbestvanîyê nîşan bide.



DOÇ. DR.
ABDURRAHMAN ADAK

**TÊGEHA** biharê bi nêrîneke sethî di çarçoveya sêkoşeya kozmolojî, zeman û mekan de dikare bê pênasekirin. Lewra tevgerên kozmolojîk guherîna zeman bi xwe re tînin, bi guherîna zeman werzên salê derdikevin meydanê û bi guherîna werzên salê jî guherînên siruştî çê dibin. Loma di werzên bihar, havîn, payîz û zivistanê de taybetîyên siruştê ji hev cuda ne. Di van werzan de flora, fauna û hêmanên siruştê dirûvên nû werdigirin. Lêbelê di nav her çar werzan de ya xwedîyê siruşteke cuda û taybet bihar e. Ev siruşta taybet a biharê ku tê de bedewî, aheng û geşbînî heye bala insanan kişandiye û roleke taybet bexşî wê kiriye ku werzên dî yên salê ji vê yekê bêpar mane. Bihar û siruşta wê çawa ji alîyê disîplînên curbicur ve bûye mijara lêkolînan, ji alîyê bedewîya xwe ve jî bûye mijara edebîyat û hunermendên peyvê. Çi li şaristanîyên cuda yên dinyayê, çi di şaristanîya şerq-Îslamê de be ferq nake, bihar her dem temayeke girîng a metnên edebî ye. Ev yek çawa diyardeyeke edebîyatên erebî, farisî û tirkî ye, bi heman rengî diyardeyeke edebîyata kurdî ye jî. Di çanda edebîyata klasîk de helbestên bi temaya werzan bi navên taybet hatine binavkirin û "biharîye" jî ji helbestên bi temaya biharê re wek nav hatiye bikaranîn. Temaya biharê ewqasî bala helbestvanan kişandiye ku di encamê de biharîye di nav poetîkaya edebîyata klasîk de bûye yek ji cureyên edebî jî.

### Iqlîma Kurdistanê û Bihar

Siruşt bi giştî ji hêmanên wek riwek (flora), heywan (fauna), av, hewa, ax û agir (çar element) pêk tê ku ev hêman bi awayekî pir zindî di siruşta biharê de jî tên dîtin. Ji hewaya paqij û xweş, co û çemên siruştî; baxçe, çiya û deştên hişîn; dar, giya, kulîlk û çîçekên bibîn; teyr û tilûrên dengxweş û kîvroşk û xezalên bedew wêneyekî temsîlî yê hêmanên biharê dikare bê derxistin. Ji ber ku dîmenekî bi vî rengî di biharên welatê kurdan de bê nuqsanî dikare bê temaşekirin, vî dimenî bê nuqsanî rengê xwe daye metnên edebî yên kurdî jî. Aşkera ye ku heman dîmen li hemû welatan nayê dîtin û loma jî rengvedanê biharê di edebîyatên wan welatan de jî dê cuda be. Bi rehetî dikare bê gotin ku cudabûna iqlîmên welatan, bandorê li temaya siruştê ya edebîyatên wan welatan jî dike. Bo nimûne ji ber ku li welatên nêzî cemsara Bakur (wek Rûsya) iqlîma sar û li welatên nêzî iqlima çolê (wek Erebistanê) iqlîma germ serdest e, van iqlîman rengên xwe dane edebîyatên wan welatan jî. Eger di metnên edebî yên ku li Erebistanê hatine nivîsîn de, germ, havîn û çol serdest be, di metnên edebî yên rûsî de jî serma, zivistan û cemed dê serdest be. Dema em ji vî alîyî ve li Kurdistanê dinêrin, em dibînin ku li Kurdistanê ne germa Erebistanê, ne jî sermaya Rûsyayê serdest e; çawa ku havîn, payîz û zivistan tên dîtin, bi heman rengî bihar jî li Kurdistanê tê dîtin û bi hemû alîyên wê yên xweş û geş û tê pêşwazîkirin. Loma temaya biharê bi hemû rengên xwe di nav metnên edebî yên kurdî de jî cihê xwe girtiye. Ewlîya Çelebî dema di sala 1642an de çûye herêma Behdînan, ev diyarde bi çavên xwe dîtiye û tesbît kiriye. Çelebî dibêje ku dema li Behdînan Newroz tê zarok, mezin, zana û helbestvanên wan bi hev re diçin seyrangehan û helbestvanên wan li wan seyrangehan helbestên curbicur dixwînin (Evlîya Çelebî, Günümüz Türkçesiyle Evliya Çelebi Seyahetnamesi, YKY, Istanbul, 2010, b. II, r. 711-713).

### Newroz û Bihar

Di edebîyata kurdî ya klasîk de Newroz tu caran ji biharê cuda nehatiye hizirkirin. Ji ber ku bihar bi Newrozê dest pê dike, Newroz ji bo biharê wek sembolekê hatiye qebûlkirin û bikaranîn. Bi rehetî dikare bê gotin ku di tevahîya tarîxa edebîyata kurdî de, bi hemû zaraveyên kurdî wek nîşaneyeke biharê behsa Newrozê hatiye kirin û Newroz wek sembola şadî û kêfxweşîyê hatiye destnîşankirin. Ji ber ku di edebîyata kurdî ya klasîk de komek metnên edebî yên bi temaya Newrozê peyda dibin, ev helbestên bi vê temayê bi navê "Newrozîye"yê cureyeke edebî jî saz dikin.

### Fonksiyonên biharîyeyan

Nivîskar û helbestvanên kurd ev hezar sal heye ku hest, hizr û zanyarîyên xwe di nav estetîk û ahengekê de bi kurdî îfade dikin. Mijara siruştê ku temaya biharê jî beşek ji wê ye, digel mijarên dîn, tesewif, felsefe, hikmet û evînê bûye yek ji mijarên karakterîstîk ên edebîyata klasîk. Bawerîya helbestvan temayên dînî-tesewifî, eqlê wî temayên felsefî-hikemî, derûnîya wî temayên evînî û cîhana wî ya derekî jî temayên siruştî encam didin û ev tev bi hev re kesayeta wî ya edebî derdixin meydanê. Li gor doktrîna tesewifa felsefî siruşt bi serê xwe ne xwedîyê hebûnê ye. Hebûn yek e ku ew jî hebûna Xweda ye. Siruşt jî di nav de tiştên ku em hebûnê li wan bar dikin wek siha Xweda ne. Çawa ku hebûna sihê ne heqîqî ye, hebûna siruştê jî ne heqîqî ye. Hemû dîmenên siruşta biharê tecellîya nav û sifetên Xwedê ne. Helbestvanê klasîk ji vî alîyî ve bi nêrîneke ontolojîk siruştê bi Xweda ve girê dide, ji alîyekî ve jî dikeve bin bandora bedewîya siruştê û ji siruştê zewq û heyecaneke derûnî werdigire. Ev zewqa ku helbestvan ji siruştê werdigire di nav geşbînî û bedbînîyê de bi kêfxweşî û istiraba wî ya evînî re têkel dibe. Lewra bedewîya yara helbestvan dişibe bedewîya bêsînor a biharê, lêbelê çawa ku bedewîya biharê bi sînor e, wusleta bi yarê re jî bi sînor e. Çawa tê dîtin helbestvanê klasîk siruşta biharê di nav têkilîyeke sê alî de dinirxîne ku ew jî Xweda, siruşt û insan in û di vê têkilîyê de cihekî navendî bexşî siruştê dike. Ji bilî vê şîroveya ontolojîk ku li siruşta biharê tê barkirin, divê bê îfadekirin ku heta dereceyekê rengê çanda civakî û siyasî ya serdema wan jî di biharîyeyan dikare bê dîtin. Di sedsala me de digel van fonksiyonên navborî, fonksiyoneke neteweyî jî li biharîyeyan hatiye barkirin û bihar wek sembola rizgarî û azadîyê hatiye dîtin.

### Estetîka biharîyeyan

Ji ber taybetîya karakterîstîk a edebîyatê, dema helbestvan bi van perspektîfan behsa siruşta biharê dike, xala ku jê tewîzê nade estetîk û hunera metnê edebî ye. Siruşta biharê ji helbestvan re dibe mecalek ku hunera xwe ya bilind derxe meydanê û hêza xwe ya helbestvanîyê nîşan bide. Helbestvan di vê çarçoveyê de serî li gelek hunerên edebî dide ku teşbîh, mecaz/istî'are, teşxîs û intaq hin ji wan in. Herweha metnên xwe yê edebî bi ahenga melodîk a kêş, serwa, tekrîr, muwazene, cînas û alîterasyonê û bi teşeyên curbicur ên nezmê dixemilîne.

### Helbestvanên biharîyenûs

Dikare bê gotin ku hemû helbestvanên kurdan bi awayekî cih dane temaya biharê. Lêbelê hinan ji wan girîngîyeke taybet dane biharîyeyan û bûne nûnerên vê cureya edebî. Di tarîxa edebîyata kurdî de cureya biharîyeyê di serdema mîrektîyên kurmancan de di sedsalên XVII û XVIIIem de gelekî pêş ketiye û gihîştiye asteke bilind a edebî. Di vê serdemê de Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî, Sewadî, Mela Bateyî û Mela Mensûrê Girgaşî wek nûnerên herî girîng ên biharîyeyan derdikevin pêş. Di serdema piştî mîrektîyan û dawîya Osmanîyan de Şêx Ebdurehmanê Aqtepî û lawê wî Şêx Eskerî û di sedsala me de jî Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj, Mela Ehmedê Nalbend, Mela Ehmedê Zinarexî û Mela Ehmedê Mermerî wek nûnerên girîng ên biharîyeyan derdikevin pêş. Hêjayî gotinê ye ku helbestvanê dawî Mela Ehmedê Mermerî geştnameyek jî nivîsîye ku ew jî cureyeke binbeş a biharîyeyê ye. Di geştnameyan de li ser geştên ku di biharê de tên lidarxistin û kesayetên ku beşdarîya geştê kirine tê rawestan. Di hewzeyên dî yên edebîyatên kurdî de jî nûnerên biharîyeyan hene. Salim û Wefayî ji bo edebîyata kurdîya soranî û Mewlewî jî ji bo edebîyata kurdîya goranî/hewramî wek nimûne dikarin bên dayîn.

### Metnên nimûne

Li jêrê ji helbestên bi temaya biharê guldesteyek hatiye bijartin:

**Baba Tahir**

Behar amed be sehra û der û deşt
Cewanî hem beharî bud û biguzeşt
Serî qebrî cewanan lale rûye
Demî kî mehweşan ayen be gulgeşt

**Melayê Cizîrî**

Reyhan û sunbul tê hene sed çîçek û gul tê hene
Zerbav û bulbul tê hene ew baxçeya gulzarê xet
•
Allah li min hubba te çi şekker û nebat e
Ji nû ve dê ciwan bim ger bihn bikim gula geş
•
Buxçeya sorgul di geş tê çîçek û reyhanê reş tê
Dilrubayan tîne geştê sunbulan ta ta sema ye

**Ehmedê Xanî**

Di fesla Nûbiharê de digel dilber biçin geştê
Ji ew xweştir umur nabit li min ev hal qewî xweş tê
•
Her yek ji newal û kûh û deştan
Reh şubhetê goşeyêd biheştan

Xergûş û xezal û gûr û ahû
Ev qaz û quling û kebk û teyhû

Kerker diçerîn li koh û deştan
Ref ref difirrîn di nêv biheştan

Fesla bigerin li geşt û seyran
Nêçîrê biken ji wehş û teyran

**Sewadî**

Baê seherê ji bêhnê sunbil
Dunya kiribû tijî qerenfîl

Dunya wekû cenneta Îrem bû
Sed rengî şibîte bûqelem bû

Ew çîçek û sorgul û nebatat
Bûn me'det û zînet û cimadat

Dil hey dikirin sedayê bilbil
Şeydayê cemalê alê sorgul

**Mela Mensûrê Girgaşî**

Subhan ji Şahê bêçûn çi biharek keskûn e
Qadirê "kun feyekûn" ji erdan derbûn 'iyûn e
Kuh(i)sarê di mehzûn bi izna wî vebûne

Cûbar û bax û bistan kamil bibûn tevave
Şehlûl û 'endelî bûn meşyane hatin nave
Cewab bibine reqîban wal' nergiza xunav e

**Cegerxwîn**

Bihar xweş e çaxê gulan.
Çaxê kulîlk û sinbilan.
Newroz û sersala dilan.
Kengî bi xêr bêtin bihar?
--
Zanim bihar azadî ye.
Serbestî û dilşadî ye.
Doza me cejna madî ye.
Kengî bi xêr bêtin bihar?



## Rewşenbîr û hunermendên kurd:

# Bila Newroz bibe cejna serxwebûnê!





NÛJÎN ONEN
DERYA KILIÇ

**ROJA** 21ê Adarê ango cejna Newrozê bo kurdan bûye roja serkeftin, hevgirtin û yekîtîyê. Herwiha bûye sembola bilindkirina doza mafên rewa ên kurdan. Nivîskar, rewşenbîr û hunermendên kurd bo heftenameya Basê axivîn û peyamên xwe yên Newroza 2017an dan. Rûspîyên kurd, hêvî dikin ku Newroza îsal bibe cejna serxwebûna başûrê Kurdistanê û serkeftin û hevgirtina hemû kurdan.

**Nivîskar Evîn Şikakî: Hêvî dikim kurd yekgirtî bin**

21 Adarê yekem roja biharê ye, di wê rojê de bihar dest pê dike, ew roj destpêkeke nû ye. Newroz ne wekî cejnekê lê bêtir bi wateya xwe ya sîyasî û dîrokî tê pîrozkirin. Lewre kurdan Newroz kirine wek alavek an jî çekeke ji bo berdewamîya rêbaza xwe ya sîyasî û dîrokî û ji bo bidestxistina mafê gelên kurd. Wekî ku em dizanin li hemû parçeyên Kurdistanê, çi Başûr, Rojava, Bakur û Rojhilat be, pîrozkirina wê rojê dihat qedexekirin. Heta niha jî hewlên wan her ji bo qedexekirina wê rojê ne, lê ew roj dihate vejîn, dihate pîrozkirin, kurdan li ber xwe dida û dê her li ber xwe bidin ji bo cejna xwe ya neteweyî pîroz bikin. Êvara Newrozê kurd agir vêdixin, vêxistina agir weke sembolekê ye, di maneya jîyanê de ye li cem kurdan, ji ber ku agir di felsefa zerdeştîyan de nîşan e di navbera şerê heqî û neheqîyê de ye. Hêvîyên min ji bo Newroza îsal ev in: ez aştî, aramî û seqamgirîyê ji her çar perçeyên Kurdistanê re dixwazim. Bila her kes di aramîyê de û bêtirs bijî û pirsgirêkên navxweyî yê di nav mala kurdî de çareser bibin. Kurd bi yek dilî, yek dengî û yek helwestê li hember dijmin rawestin.

**Rewşenbîr Mehmet Emin Özbilen: Hêvîya min serxwebûn û dewletbûn e**

Helbet Newroz roja azadîyê ye, tê wateya serxwebûnê, serfirazîyê. Lê îro em nikarin li gor dilê xwe Newrozê pîroz bikin, jixwe derfetên me tune ne û yasayên hundirîn jî derfetan nadin. Digel vî awayî jî, dema em Newrozê pîroz dikin ew sloganên demode bûne îcabet nakin. Hêvîdar im Newroza me pir baş derbas bibe, lê piştî em nikaribin li gor dilê xwe Newroza xwe pîroz bikin... Ti carî bawer nakim ku dilê her ferdekî kurd ne bi Kurdistaneke azad û serbixwe re ye: Ev xeyala hezar salan e. Ev Newroz bê pîrozkirin jî neyê pîrozkirin jî dê di dilê her ferdekî kurd de xakeke rizgar hebe. Hêvîdar im her dem û her sal Newrozên baş bibînin, bi kincên xwe yê neteweyî, bi stranên neteweyî û bi her cûreyî bikaribin Newroza xwe pîroz bikin. Kurd, ev 1400 sal in hê negihiştine statûyeke mayinde. Divê di pîrozbahîyên Newrozê de ne ku em bi tenê bi kinc û libasên neteweyî li ber dahol û zurnê govend û semah û dîlanê bigrin. Divê em bikaribin doza welatekî azad û serbixwe bikin. Newroz li ser xakeke azad tê pîroz kirin. Di Newrozê de ez dixwazim hemû hestên xwe bo we bêjim, ew hest jî dewletbûn e.

**Nivîskar Temûrê Xelîl: Bila Newroz bibe cejna azadîyê**

Hêvî dikim ku ev cejn bibe cejna azadî, serxwebûn û pêşketinê; bila gelê me azad bibe. Lê sal bi sal em dibînin ku rewş her diçe xerabtir dibe, dema li cejna Bakur dinêrim, millet gelekî tev li şahîyan dibe lê alayeke kurdistanî lê tune ye. Ez naçim wan cejnên ku bi hezaran kes beşdar dibin lê alayeke Kurdistanê tê de tune be, ev tiştekî nexweş e. Ez zanim ku ew kesên ku li Bakur tevlihevîyê derdixînin, heman kes in û çûne li perçeyên din jî tevlihevîyê derdixînin. Li Başûr statuyeke kurdan heye, biryara wê statuyê kurdên wir didin, kurdên Bakur û Rojava qet eleqeyê wan bi wê tune ye. Ez dizanim kêfa millet tune ye vê cejnê wek salên bihurî derbas bike, ji ber ku heger kuştî hebin, şer hebe xelk ji malên xwe bar dikin, malên wan wêran dibin. Ji bo min îro ne cejn e mesela, 21ê Adarê bêtir wek şînê ye. Lê cejna gelê me ye, weke sembolekê divê em hêvîya xwe jî jê nebiri. Ez cejna hemûyan bi dil pîroz dikim. Bi hêvîya ku hemû kurdên welatparêz û dilsoz di nav xwe de yekîtîyê ava bikin, lê ne kurdên ku li dijî alaya Kurdistanê ne û li dijî statuyeke Kurdistanê ne, li Başûr an perçeyekî din.

**Hunermend Seywan Saedîyan: Newroz roja vejînê ye**

Newroz li her parçeyekî bi awayekî cûda tê pîrozkirin, lê dîsa jî yek ji wan mijarên ku kurdên li perçeyên din li ser dibin yek, ew jî roja newrozê ye. Mesela li her perçeyekî Kurdistanê ev roj bi cudahî tê pîroz kirin. Newroza rojhilat destpêka sala nû ye û li rojhilat cejna herî mezin cejna newrozê ye. Cejneke ayînî ye û ne tenê di yek rojê de tê pîrozkirin lê 13 rojan tê pîrozkirin. Sersala wan roja newrozê ye. Ez hêvî dikim ku ev roj vegere nav gelên din jî û ew jî sersala xwe bi roja newrozê destpê bikin. Ji ber ku hem ji hêla siruştî hem ji hêla moral ve pir cûda ye, vejîneke siruştî heye. Ev hêvî û vejîn jî bandora wê li ser jîyanê jî heye. Bi vî awayî em dikarin bibêjin hêvîyeke biçûk heye ku kurd ji alîyê siyasî û civakî ve bikin yek.

**Rewşenbîr Talat İnanç: Dixwazim kurd bigihên armancên xwe**

Newroz ji gelê me re rojeke pîroz e, di hiş û bîra milletê kurd de xwedî nirx û rûmeteke gelekî berz û bilind e. Ji mêj ve tê, dîrokî ye. Di wêjeya gelêrî de, di edebîyata klasîk a kurdî de, di nav helbestên Melayê Cizîrî de, di Mem û Zîn a Ehmedê Xanî de Newroz roja şeng û şadîyê ye. Newroz, cejna me ya herî kevin a bi bang û deng û beng e; bi stran, bi govend û dîlan e, ew evîna dilan e. Ji ber vê yekê ye ku gelê kurd bi hezar salan e Newroza xwe pîroz û ezîz hildaye û parastîye. Di vê pêvajoyê de, di van salên bi dehan ên dawîyê de, Newroz, li Başûr û Bakur û Rojhilat û Rojava wekî rojeke xwedî roleke girîng derketîye pêş. Ev roj e ku îro destê me kurdan bi hev digihîne, dil û gîyanê me ber bi hev tîne. Divê em qedr û qîmetê vê rojê baş zanibin.

Hêvîya min ew e ku bila şerr û birakujî di nav kurdan de hew biqewime, ne li Şengalê, ne li Rojava û ne li ti deverê. Min bawerî heye ku wê Newroza îsal li me bi xêr were, ku wê serxwebûn li Başûr pêk bê û wê Serok Mesûd Barzanî daxuyanîya dewleta Kurdistanê bi cî bîne. Li Bakur, min divê bila serokê HDPê Selahattin Demirtaş û parlamenterên hevalên wî ji heps û zîndanan azad bibin, bila aştî û demokrasî li Tirkîyeyê bi ser keve. Newroz pîroz be.

**Nivîskar Naci Kutluay: Kurd dê di Newrozê de bigihên mafên xwe**

Newroz ji bo kurdan rojeke dîrokî ye. Ez di wexta partîyê de bûm, dihatim Dîyarbekirê. Wê demê gelek Newroz baş derbas dibûn. Ez hêvî dikim ku di vê Newroza pêşîya me de di navbera Tirkîye û kurdan de tiştên mezin û baş bibin. Demokrasî bi pêş bikeve. Divê mirov qebûl bike û bibêje ku rewş wisa derbas nabe. Hêvîya min ev e ku li Tirkîyê demokrasî, wekhevî, bîratî, mafên mirovan, kurdan û milletên din bi pêş bikeve û bên dayîn.

**Rewşenbîr Süleyman Çevik: Bila kurd di Newrozê de li hev bên**

Newroz li hemberî zilm û desthilatdarîyê ye. Newroz bi salan e di nav kurdan de tê piroz kirin. Her sal bi cejn û dostanîyetî dihat piroz kirin. Ez nizanim dê vê salê çawa bibe. Rewşa awarte heye. Ji alîyê din vê gelek kurd dibêjin em dê piroz bikin. Ez hêvî dikim ku Newroz di nav aştîyê de derbas bibe. Em naxwazin Newroz bibe sebebê tiştên nexweş û kuştinê. Ez hêvî dikim ku bi awayekî aştîyana bê piroz kirin. Heger partîyên sîyasî yên kurd li hev bikin, ev Newroz dê bibe Newrozeke baş. Înşallah li hemû cihanê bi awayekî aştîyane derbas bibe. Ji bo vê divê dewlet û kurd rolên xwe bînin cih. Hewce ye kurd sûkunetî ji beşdarbûnên xwe re tewsîye bike. Rola dewletê li vê derê zêdetir e. Divê dewlet ji bo Newrozê pêşîya kurdan negire. Nebe sebep ku kurd cejnê pîroz nekin. Divê dewlet ji van re astengîyan dernexe.

**Nivîskar Şakir Epözdemir: Hêvî dikim tiştên xirab bi dawî bibin**

Newroza îsal weke her salê dê miheqeq germ nebe. Ji ber ku însan gelek êşîyan. Ez bawer nakim dê weke salên berê bibe. Ez hêvî dikim ku vê rewşa niha bi dawî bibe û hemû tişt ber bi başbûn û pêşketinê ve biçe. Kurd ji ber bûyeran ne kurdên par û pêrar in. Dilên wan sar bûye. Ji ber vê jî ez texmin dikim beşdarên vê Newroza Dîyarbêkirê dê kêm bin. Bo mînak dema ku qeyyûm li ser şaredarîyan hat avêtin ti kesî dengê xwe nekir. Kes dengê xwe nake. Dibe ku meseleyek tê de heye ku kes dengê xwe nake. Xelk sar e. Ew doza rizgarî û azadîyê dikin. Heger azadî û rizgarî wisa be, ji bo çi kêfa xelkê ji wê rizgarî û azadîyê nayê.

### HUNERMEND ASLÎKA QADIR: BILA KURDÊN ME HEV BIGRIN

Newroz, bi qirnan hatiye gihiştiye me, sembola serhildanê û azadîyê ye. Hûn dikarin bifikirin 2640 sal berê di kûrahîya dîrokê de, kurdên me milletê me ev cejn pîroz kiriye. Berîya îslamê kurdên me ev cejn giş pîroz kirine, ji ber ku ev sembola azadîyê bûyê. Piranîya kurdan bûne misilman lê ew kurdên misilman jî vê cejnê pîroz dikin. Ev jî tê vê maneyê ku ew li ser esasê koka xwe ma ne. Newroz weke bûka biharê tê hesêb, em wek sala nû û weke roja nû wê bi nav dikin. Em her sal xwe amade dikin bo bikaribin bi dilekî xweş Newrozê pîroz bikin. Cejna me ye, divê em bi def û zirnê, bi stran û reqsê bimeşin. Weke hunermendekê ji bo Newroza îsal dilê min şa nabe, ji ber ku kurdên me yekîtîya xwe çênakin, nêvîyê kurdên me serxwebûna Kurdistanê naxwazin. Tiştekî ecêb e, li dinyayê kê dîtîye yek nexwaze welatê wî serbixwe bibe. Di vê Newrozê de destê me li ser dilê me ye, gelo wê çawa derbas bibe? Gelo tiştin çênebin ku em rûnin û bigrîn? Niha Kurdistan ber bi serxwebûnê ve diçe û ev dilê me gelekî kêfxweş dike. Dixwazim bibêjim, roja Newrozê li cem kurdên sovyetê jî bi kuloçan tê pîroz dikin, kuloç jî tradîsyoneke kurdên Sovyeta berê ye. Morîyekê jî dixin nav wê, roja Newrozê morî para kê bikeve, ew wê salê bextewar dibe û karê wî baş dibe. Min jî kuloç çêkirîne û belav kirîne, ka em binêrin bê morî para kê dikeve.





İSMAİL GÜVEN

## Gedeyî û Dadî-Babî (1)

Mi her di nuşteyanê xo yê verênan de derheqê psîkolojîyê sosyalî de nuşt. Labelê ez do na rey wareyê psîkolojîyê xurtbîyayîşî (development psychology) de binusa. Ez nêzdîyê şeş serran gedeyan reyde xebetîyaya. Nê şeş serran de gelek dadî û babî, gedeyanê xo ver (!) bi problemanê cîya-cîyayan ameyê verê mi ke hetkarîye bîgêrî. Xora mi zî goreyê zanayeyê xo hetkarîye înan kerdêne. Labelê mudeyêk ra pey mi dî ke, zafaneyê waqayan de gedeyî probleminî nîyê; esas dadî û babî problemin î. Na rastîye ke ez bi pratîkê şeş serran (beno ke seba tayênan tay bo) û zanayeyê xo ginaya ser, her çend dadî û babîyan nerehet bika zî wina ya. Ez wazena nê rêzenuşteyê xo de dewranê xurtbîyayîşî, kerdenê dadî û babî, konseptê xelate û ceza binusa û hewl bida ke şaşî û rastîyan nîşanê dadî û babîyan bida.

Psîkolojîyê xurtbîyayîşî de gelek teorîyê xurtbîyayîşî estê. Labelê mîyanê nînan de "Teorîya Xurtbîyayîşo Psîko-sosyal" yê Erik Eriksonî ya tewr namdar a. Ez do nê nuşteyê xo de hewl bida ke gedeyan bida sinasnayîş. Çimkî goreyê mi eke ma gedeyan hol nêsinasne, kerdenê ma yê verba înan zî netîceyêka hole nêdanê ma. Na teorî de heşt dewrê xurtbîyayîşî estê. Seba ke nê rêzenuşteyî de mewzûyê ma gede yo, ez do tena çar dewranê verênan binusa.

1) Dewrê Bawerîya Bingeyine yan zî Bêbawerîye (0 – 1)

Gedeyî nê dewrî de pabesteyê dinyaya teberî yê. Îhtîyacîyê înan çend bîyerî ca, dinyaya teberî hende sey cayêkê pozîtîfî vînenê. Nê dewrî de eke dadî û babî bawerîye bidî gedeyî yanî binê înan wext de pak bikî, hol miqate bibî û bikî ke hewnê xo tam bîgerî, gedeyî dewranê ameyoxî de bi bingeyêko hîna pozîtîf ewnîyenê dinya ra û hîna hol derbaz kenê. Eke no dewr bi hewayêko serkewte temam bibo, gedeyî de hîsê "hêvî" û "adaptasyonî" aver kewena. Labelê eke dadî û babî îhtîyacê gedeyî pêgoş bikerî, dinya seba gedeyî bena cayêko ke bawerî nêdana. Û gede seke leng o derbazê dewrê ameyoxî beno.

2) Dewrê Otonomî yan zî Şarme û Endîşe ( 1-3)

No dewr de gede êdî beno pîl, keweno pay, nata-weta gêreno, dormaleyê xo mereq keno. Vano qey ez eşkena dinyaya teberî kontrol bika. No dewr seba gedeyî çend hol derbaz bibo, bawerîya gedeyî hende bi xo zêdîyena. Labelê, eke dadî û babî mudaxaleyê her çîyê gedeyî bikerî, vernîya gedeyî bîgêrî, çalakîyanê ey asteng bikerî o wext gedeyî de herinda hîsê bixobawerîye hîsê endîşe virazîyeno. Coka dadî û babî ganî nê dewrî de zaf mudaxaleyê gedeyî nêkerî. Hetahetê gedeyê xo bi yew tirsî nêqefelnî. Û verba probleman de gedeyê xo bêçeke nêverdî. Çimkî eke gede her fir asteng bibo, bi hêzê xo nêhesîyeno û nêeşkeno probleman çareser bikero.

3) Dewrê Însîyatîfgirewtişî yan zî Sucdarîye (3-6)

Hîrê serran ra dima gedeyan de sîstemê îskelet û masûlkeyan beno xurt. Gede pabestîyîya dadî û babî ra biney bo zî xelesîyeno. Êdî eşkeno wazîfeyanê xo yê rojaneyan xo bi xo zî bikero; îhtîyacîya tiwaletî, vurnayîşê kincan ûsn. No hêzo newe, gedeyî de fikrê "egosantrîzm" virazeno. Heto bîn ra vano qey hêzê xo reseno bi her çî. Coka mudaxaleyê dormaleyê xo keno, wazeno însîyatîf bîgêro, wazeno çîyanê neweyan biceribno. Yanî nê pêro çîyê normal î. Ganî dadî û babî destûr bidê gedeyê xo. Çimkî gede çend însîyatîf bîgêro hende ser keweno û xo serkewte vîneno. Xo sey yew ferdî hesibneno. Û ameyox de hîna asan keweno mîyanê merdiman, qise keno, fikrê xo vano û xo îfade keno, beno ferdêko berpirsîyar. Labelê eke nê teşebusê gedeyî hetê dadî û babî ra asteng bibê yan zî gede nê teşebusan ver rastê cezayî bîyero, gedeyî de herinda hîsê serkewtişî de hîsê sucdarîye vejîyena werye. Aktîvîteyan ra dûrî vindeno, însîyatîfgirewtişî ra terseno û her sernêkewtişî de xo sucdar vîneno.

4) Dewrê Serkewtişî yan zî Xokêmvînayîşî (6-11)

Û ma ameyê dewrê mektebî. Gedeyo ke dewrê hîrêyinî de kewtibi mîyanê hevalan, nê dewrî de qismêko muhîm yê wextê xo bi hevalanê xo vîyarneno. Gede her çend mîyanê hevalanê xo de bo zî, no dewr de seba xo gêreno yew "modelî". Eke keye de yew model nêvîno, na rey teber de gêreno. Na taybetîya nê dewrî seba dadî û babî hem yew avantaj a hem zî yew xeterî ya. Çimkî îhtîmal esto ke teber de xo rê yewê xirabî sey modelî bivîno, yan zî yew estareyê televîzyonî. No dewr de "xebatkerîye" zî seba gedeyî çekuyêka zaf muhîm a. Gede xo çend serkewte bivîno, çend bieşko probleman çareser bikero hende kesayetîya ey ronişena û bena xurte. La eke vernîya xebate ey bera girewtiş gedeyî de hîsê xokêmvînayîşî peyda beno.

...

(Ez do nuşteyê xo yê ameyoxî de Hewayê Ewnîyayîşê Dadî û Babîyan ser o binusa. Bimanîn weşîye de.)

# Charlî Chaplîn yan zî hêzê bêvengîye: Şarlo



Charles Spencer Chaplîn, 16 Nîsane 1889 de Londra de maya xo ra bî û 25 Kanûne 1977 de wefat kerd. Rejîsorê sînema, kaykerdox, nuştox û komedyeno îngîlîz Charlîe Chaplîn, hafizaya merdiman de bi qerakterê "Şarlo"yî (Charlot) ke hetê ey ra ameybî ganîkerdiş ca girewt. Ewro hema zî bi nê nameyî ci ra yeno qalkerdiş.

Keyeyê înan yew taxa ke tede feqîran roniştêne de bî. Ma û pîyê ey hunermendê profosyonelî bîy û muzîkholan û tîyatroyan de xebitîyayêne. Ê, hema ke Chaplîn nêbîbî 3 serreyî, yewbînî ra cêra bîy. Chaplîn, ma û birayê xo reyde ciwîyayêne û nêweşîya psîkolojîke ya maya xo ver şertê cuya ey hîna zehmet bibîy. Maya ey semedê tedawî neqlê merkezê rehabîlîtasyonî bîye. Naye ser o Chaplîn û birayê ey pîya derbazê hetê pîyê xo bîy û gama ke o 12 serreyî bî, pîyê ey wefat kerd. Charlîe Chaplîn û birayê ey, halê maya înan ver teslîmê keyeyê muqatebîyayîşî bîy. La heyf ke şertê nê keyeyê muqatebîyayîşî baş nêbîy û Chaplînî, uca wextê çetinî vîyarnayî. Bi serran dima na rewşe do awanbîyayîşê sînemaya ey ser o zî tesîr bikerdêne

Her di birayan, qebîlîyet û zanayîşê xo ma û pîyê xo ra girewtbîy û bi sayeyê naye tîyatroyan û muzîkalan de dest bi xebate kerd. Chaplînî, sexne ser o tecrubeyo profosyonel o tewr verên gama ke grûba "The Eîght Lancashîre Lads" mîyan de xebitîya qezenc kerd.

Chaplînî,1908 de kumpanyaya Fred Karno ke kumpanyayêka namdare ya ê dewrî bîye, mîyanê aye de ca girewt. Kompanyaya gêroke reyde mabênê 1910 û 1912î de sedemê turne şî Amerîka. Dima Amerîka ra anêgera Îngilîstan û tîya ca bî. 1913 de wextê yew numayîşî de performansê ey bala Mack Sennetî ante. Sennet, wayîrê studyoyanê Keystone bî û Chaplîn peymana ey îmza kerde û daxilê ekîbê ey bî. 1914 de bi filmê xo yo yewin "Makîng a Lîvîng" tîpê Şarloyî awan kerd. Keystone reyde serrêk xebitîya, 35 fîlman de rol kay kerd û bi no hawa bî namdar. Bi sayeyê qerakterê Şarlo û kaykerdoxîya xoya bêemsale temamê dinya bibî heyranê ey la bêrîn dîyar ke muracatê ey ê hemwelatîbîyayîşî hetê Amerîka ra ame redkerdiş.

Sey 4 zewacê eyê ke xo ra ciwanêr cinîyan reyde kerdbî, derheqê ey de abîyayîşê dewaya pîyîtî, demê ancîyayîşê fîlmê The Immîgrantî de yew memurê DYA (Dewletê Yewbîyayeyî yê Amerîka) rê paşkule eştene sedemanê cîya-cîyayan ra eleyhê ey de kampanya dîyaye destpêkerdiş û DYA rê dekewtişê ey ame qedexe kerdene. Naye ser o cinîya xo Oona O'Neill û domananê xo pîya bar kerd û şîy Swîs. (İsvîçre) 1973 de seba ke Xelata Oscarî ya Taybete bigîro agêra DYA. Çend serrî dima bi fîlmê xo "Limelight"î (Roşnayê Sexneyî) yewna rey Xelata Oscarî girewte. Wexto ke 86 serreyî bî (serra 1975î de) hetê Qiralîçaya Îngilîstanî Elîzabetha Dîyine ra nîşanê şovalyetîye dîya ci.

**Filmografîya Ey**

Charlîe Chaplîn, fîlmanê xo de timûtim mesaj dayêne. Bi fîlmanê xo çepgirîya xo dîyar kerdêne. Fîlmanê xoyê bêvengan de "buhranê (depresyonê) pîlî yê serranê 1930an" ser o vindert û The Trumpî (sûtal) de polîtîkayanê xiraban ê îdareyî ke vera feqîrîye tetbîq bîyêne rexne kerd. Filmê xo Modern Times de (Wextê Modernî) bale ante rewşa karkeran û şarê feqîrî ser. Bi fîlmê xo The Great Dîctator (Dîktatoro Gird) Almanyaya Nazîyan bi hawayêko cîdî rexne kerd.

**Çend fîlmê ey ê muhîmî nê yê:**

A Woman of Paris (1923), The Gold Rush (1925), The Circus (1928), City Lights (1931), Modern Times (1936) The Great Dictator (1940), Monsieur, Verdoux (1947), Limelight (1952), A King in New York (1957), A Countess from Hong Kong (1967)







18 NÎSANE 1930 DE BBC RA NO ANONS AME EŞNAWITIŞ:"EWRO TU XEBERE ÇIN A" DIMA RA MUZÎKÊ PÎYANOYÎ AME WEŞANAYENE.

## Bawula sîyaye ya raywanî/e

Ya Homayê mi ge êno ge şono aqilê mi
nika kotî bî, nika kotî bî,

To bi sebrê kemere û ruhê awe ez kerda pîl
Coka ez key şira aqilê mi de yo fikrê mendişî

Pêrune ra derbaz bîya ez, wina bi huner
ke ê vanê qey ez hema ciwîyena

mi fehm kerd yewna mana çin a dejî ra teber
tarîyîya tipûtarî ya şanî bido çareyê mi ro

sey her wextî
sey her wextî

Bîrhan Keskîn
Çarnayox: Mutlu Can

*Çime: "Yolcunun Siyah Bavulu"*
*Birhan Keskin*
*KİM BAĞIŞLAYACAK BENİ*
*Metis Yayınevi - 2010*



# Nebatê ma û ma (2)

# Nebatê ma yê daru-dermanan

EHMEDÊ DIRIHÎ (AHMET KASIMOĞLU)



KULTURÊ ma kurdan de verîna cayê nebatan estbi. Babîyê botanîkî ; Ehmedê Dînawerî Kurd bi û çi heyf ke, “Kîtabê Nebatan” Kîrmaşan de pê ziwanê erebkî nuştbi. Welatê ma Kurdistan de verîna hetanî ewro, şarê ma tay têwirê nebatanê xo, sey daru û derman gurenayî. Qaso ke ez pê zana, destê ma de çîyo nuştekî çîn o. Seke ma kîtabê Erwasî yo qîtalek ra pêhesîyayî, se serre verê cû pê herfanê aramkî, Tiba Melayê Erwasî nusîyayo.

No warê de, kîtabo tewr weş ê Prof. Dr. Selim Şahbazî yo. La çi heyf ke, bi îngîlîzkî ameyo nuştiş. Nameyê nebatanê tibî; kurdkî û erebkî zî dîyayo. Ma na lîste ra zî vînenî ke, ma kirdî (kirmancî) no warê de zî peya mendî. Hema zî kîtabê nebatanî yê daru –dermanan, pê lehçeya kirdkî (kirmanckî) nêameyo nuştiş.

Cuwa ver derheqê nameyê nebatanî daruyî ser o, lokman ekîm bîbî. Nê serranê peyênan de, lokmanê peyên zî hê dinyayê xo bedelnenî û çinay bizanî, xo de benî gorra xo. Loqman hekîmî hîn hêdî -hêdî cayê xo danî etaran. Serranê peyênan de, no warê de xebate roj bi roj ha zêdîyena.



**Kîtabê nebatanê daru-dermanan ke hetê kurdan ra nusîyayê û mi peyda kerdî, cêr ra yî:**

Bamernî, Sedullah Husên, Giya û Derman, Hewlêr 1985

Celîlyan, Abbas, Giyayên Dermanî, Kermaşan, ?

Emînî, Emîr, Therapeutic Plants in Kurdistan, Senendej, 1968

Erwasî, Şêx Mihemed, Tiba Melayê Erwasî, 2013 ?

Hekarî, Xalide, Zerzevatên Şîfadar, İstanbul, 2012

Kitanî, Mesud, Giya û Pencaret Derman, Cild I – II. ?

Saya, Ömer, GAP yöresindeki Tibî Bitkiler, Ankara, 2001.

Şahbaz, Selîm Prof. Dr., Medicinal Plants of Kurdistan, Duhok, 2013

Xalidê Hekkarî, Zerzewatên Şîfadar, İstanbul, 2012

Xidirî, Seyîd Şîhab, Kurdistan Medicinal Plants, 1961

**Nebatê ke nameyê xo de manaya daruyî nîşan danê nê yê:**

Darmelhem, gula çimdejî, kermevaş, kermevil, masîjehr, melhemêre, melhemvaş, tadar, vaş birkan, vaşê derbûn, vaşê dindanan, vaşê kerman, vaşê quxikî, vaşê tenşîyî, vila kerman.

Kulturê ma kurdan de verîna cayê nebatan bibi. Babîyê îlmê botanîkî; Ehmedê Dînawerî kurdanê Hemedan ra bi, la Kîtabê Nebatanî xu pê ziwanê erebkî nuştbi. Nê serranê peyênan de derheqê nebatanê daru - dermanan de tay kîtabê kurdkî çap bîyî. La înan mîyan de bi kirdkî meqale yan kîtabê nebatanê daru-dermanan qet çîn o. Nê kîtabî heme pê sorankî, gorankî, kurmanckî, îngîlîzkî yan tirkî nusîyayê. Unîversîteya Wanî ra İdris Kaval, dewa xu ra nameyê 150 nebatanê daruyî yê kurmanckî, pê ziwan û alfabeya tirkî sey tezê xu nuşto.

**Daruyê ma yê şîfayinî**

Ma nameyê her nebatî bi goreyê na rêze danî; nameyê nêweşîye yan kemaneyî, nameyê înanê nebatî û yê goreyê nebatanê şîfayinan ra

adirê laşî bibo: gilê vilinî yê gezo sûrin, Artemisia spicigera. pelê gowrvaş, Heliotropium europaeum.

astim bibo: pelê beyî, Cydonia oblonga

basur/ tawin / masula : Pel û toximê sîrîm, Allium

belxam bibo: pelê porê fatmay, Adiantum capillus- venerisi ;ristimê vila sosin, Primula veris.

birke bibo: pelê gowrvaş, Heliotropium europaeum.

boyê fekî bibo: gilê vilîn û pelîn û toximin, ânix, Thymbra spicata

bronşît: toximê bamya, Hibiscus esculentus, vila pilxin Datura metel

çimdejîyê: pele û vila qolpiza, İris persica; vila sosin Primula algida.

damarê geyrayeyîyê: gilê pelîn, gorcal Tribulus terrestris.

daruyê birînan / dirbetan: vilenceyê qancaraya kêwî, Cichorium glandulosum

dejê didanan: toximê hîro, Alcea flavovirens

dejê sareyî vinarneno: vilî û toximî beng (Hyoscyamus niger)

dejê sareyî kemîneno.

dejê velgan: pel û vilê, hîro, Alcea striata

dirbete / birîne: pelê xanimek, Onosma sericeum; vila tastasik Matricaria chamomilla;ristimê tirşik, Rumex pulcher

doqlêr bîyayiş: meyweyê gizbaza, Coriandrum sativum

emel bîyene / virike eştene: meyweyê zebeşa tehlî, Citrullus colocynthis; meywe û pundê vilanî încira kebayîr, Capparis spinosa.

enfeksîyonê rayirî mîze: gil,î berxulvaş. Equisetum.

ereq dano vetene: vaşê sabûnokî Saponaria officinalis

gastrît û ulser: gilê pelînî yê gula zerik Hypericum triquetrifolium

gaze pîzeyî yê pîla: meyweyê anason Pimpinella anisum, meyweyê anix, Ziziphora tenuior

gazê tutan: meyweyê vizdewrê mîrçikan, Anethum graveolens.

gonî neselneno: pel û vilî merwend, Teucrium polium

gonîkeno tenik: gilê pelin û toximî dêrzînek, Urtica dioica

goştê didanan: ristim û vilence, kenger, Gundelia tournefortii

guatr: toximî, rişwat Lepidium sativum.

hayikkerîyê / hîşyarkerîyê: meyweyê, vaşo girgilîkin Prangos pabularia.meyweyê vaşêdîkan, Fumariya asepala.

Hemilnayiş: ristim û rişele, gewen, Astragalus. pelê gulnaneyî, Mentha piperita.toximê çemen Trigonella foenum-graecum.

hormon bê duzen bî: pel û vilê, Urtica dioica.

kanserê mîde: toleyê ristimî, vizêre, Ulmus glabra.

kemanîyeyê velgan: meyweyê vam î, Amygdalus communis.

kerrayê velgan bibo: meyweyê siyateli yî, Paliurus spina christi.

kezebe / qeseba nêweş bo: bezreyê meyweyê, teliyo zelin î, Onopordum.

kuxika sîyaye / xulxutik bibo: pel û vilê, hîro Alcea apterocarpa.

lewe wedayo bo: binerdikê sîr, Allium sativum.

loqlayan de tilare bibo: toximê hebreş, Nigella sativa .

malikî bibî: gilê ternî pa vilana, kermevaş Tanacetum vulgare.

meyasîr / egzema: meyweyê şabelûyê, Quercus brantii.

mîde bidejo: pelê gelzan, Anchusa azurea

mîzac gêraye bo: vila tastasik, Matricaria chamomilla, gilê çimbeloqî, Centaurea glastifolia.

mîzbinîyê / kelmizîyê / mîzorukê: pelê vaşê dîkan, Fumarîa asepala: vaşê koteran, Fumaria microcarpa.vaşê sabûnokî, Saponaria officinalis. ristim û rîşeleyê sînzek î, Elymus repen. vila tastasik, Matricaria chamomilla, pelê na vile ereq pêxember î, Achille millefolium.bezreyê vaşê gezgezikî Urtica pilulifera.



pişike / sînede tengnefesîyê bibo: vila êxlamûrî, Tilia.

pore birişîyo: Meyweyê rê sawinê bitimî yê qizban, Pistacia terebintus.

Prostat bibo: ristim pel û meyweyî dirike, Rubus canescens.

qebizê bibo: bezreyê umînvaş, Plantago psyllium, ristim û pelê vaşê vayan, Alchemilla arvensis. ristim û rişeleyî ribês, Rheum ribes, meyweyê simaq, Rhus coriaria ra aqît vecenî, kenî daruyê qebizê. Şitê vaşê delek Euphorbia macroclada. Pel vile û gilî, vaşî derzîlok, Erodium cicutarium.

qixe/ quxike bibo: pel û vilê hîro, Alcea apterocarpa, pel û vila hîr, Alcea apterocarpa.

quwet dano. gilê vilin û pelin, gezo sûrin, Artemisia spicigera, gilê kermevaşî, Tanacetum vulgare.

rîm bibo: gilê vilinî, elbik / şimlik, Helichrysumplicatum, rîm ziwa kena.

rîmê velgan: Boçê meywayan, gilyaze, Cerasus avium.

romatîzma bibo: Qunqilî na vila, gulfaqîyê kurdî, Merendera kurdica.

romatîzmaya tutanbibo: pelî û toleyê gozî, Juglans regia.

romatîzmayo rîmin bibo: pelê zervîyalêre, Salix alba.

salim bibo: meywe û toximî hors / wers, Juniperus communis. Toximê sûrgulik, Rosa canina.

sîne / pişike nêweş bo: ristimî sus, Glycyrrhiza glabra.

sînuzît nêweş bî: meywe û awe meyweyî, xiyarok, Ecbalium elaterium.

şeker zêde bo: ristimê dirikî, Rubus canescens, meyweyê vamî, Amygdalus communis, meywe û toximî kinêrî, Cerasus mahaleb, rîşeleyê ribêsî, Rheum ribes.

tansîyon: ristimî sus, Glycyrrhiza glabra.

tengnefesîyê bibo: vila, pilxin, Datura metel.

vameke (bademcik) de rîm bibo: pel û meyweyê tuya sûrî, Morus rubra

velgan de qum bibo: vilika girgilî / garisî, Zea mays.

zarge(safra kesesi): gilî û ristimî qanikvaş, Cichorium pumilum, awzeyê zarge zêdîneno.

zerik bibo: bezreyê aspîrî, Carthamus persicus, gilê vilinî û meyweyînî, mergvaş, Cuscuta europaea.

zerrî bidejo: pelê mastêrek, Digitalis purpurea.

zerrîya bele / zerra kuel / qelb bidejo: meywe û pelî sêze, Crataegus aronia, meywe û toximî hors / wers, Juniperus communis)

**Darê ma**

Kirdê (kirmancê) ma, goreyê çar forman name danî daranê xo:

1.Êyê ke çekuya dar (dare) yena peynîya înan; asindar, gendar , guldar, koçikdar, wişkdar.

2.Êyê ke sey îzafeya nameyî name benî; dara awreşî, dara duzikî, dara selwîyî, dara tuzbeyan,


3.Eyê ke çekuya dare yena vernîya înan; dargez, dargule, darkoçik, dartizbî.

4.Êyê ke çekuya dare hem yena vernî hem zî peynîya înan: dargendar

Nameyê ke teberê nê çar forman de dîyayê daranê ma, înan ra çend nimûneyî nê yê: Alunçêre, beyêre, bowrincêre, çinayêre / dilbêre, gozêre, guncêre, henalêwrê , încasêre / salincêre, încîlowre, kinayêre, mişmişêre, payizêre, qilçêre, sêzêre, surgulêre / şilanekêre, valêre / vîyalêre, xibikêre, xirtikêre, xizumêre, zungulêre.

Seke ma tîya de vînenî, formo peyên de tayê cayan de nameyê meyweyan/fêkîyîyan dima sufîksê -er/-êr/ -êre nêno peynîya înan herinda eyînan de rasterast nameyê dare dîyeno. Grûba Vateyî sufîkrê ‘êre’yî qebul kerdo. Goz: gozer/ gozêr / gozêre. La hela ke herfa peyêne ‘r‘ bo, herindê ‘r‘ de herfa ‘y’ yena yan zî fekê Sêwregi de beno lowre. Sey çinayêre û încilowre.

Nameyê çend daranê ke sembol Kurdîstanî yê wina yê: winayî; azgilêre, baluyêre / belûyêre, lepikêre / şabeluyêre, luxpêre /xulpêre, mazêre, mazêra pelvilayêre, patilere. No formo tewr peyên goreyê zanayîşê mi ziwanê firansizkî de zî esto. nimûne eke meywe ‘pomme’ bo, nameyê dare beno ’le pommîer’. Ma het sde dara saye bena “sayêre”



Meywe ‘gilyaze’ bo, nameyê dare beno ‘le cerisier’. Ma het de gilyaze bena “gilyazêre”

Meywe ‘olive’ bo, nameyê dare beno ‘l’olivier’. Ma het zeytûn bena “zeytûnêre”

Meywe ‘fruit’ bo, nameyê darî beno ‘frutier’. Ma het meywe beno “meyweyêre”

**Bi latînkî û kirdkî nameyê tayê daran**

Acacia: akasîyêre
Acer pseudoplatanus: wişkdar
Alnus glutinosa: dargendar / gendarêre
Amygdalus: vamêre
Betula litwinowii: dara duzikî
Betula pendula: qêlîkêre
Celtis tournefortii: teyêre
Cerasus mahaleb: kinayêre / melhemêre
Cerasus microcarpa : heblîlukêre
Colutea cilicica: meşkekêre / taptapikêre
Cornus mas: dara lîlikî / lîlikêre
Crataegus szovitsii: sêzêre
Elaeagnus angustifolia: sincêre / xibikêre
Ficus carica: dara încirî / încilowre
Fragaria vesca: çîlegêre
Fraxinus excelsior : vinêre
Juglans regia: dara gozî / gozêre
Juniperus: horsêre / wersêre
Laurocerasus officinalis : salincêre
Mespilus germanica: sayêra heşî
Morus alba: tuyêra sipî
Pinus: dara çamî, çamêre
Pistacia atlantica: qizbanêre
Pistacia vera: fistiqêra entabî
Platanus: çinayêre / dilbêre
Punica granatum: dara henarî / henalowre
Pyrus communis: qorçêre
Quercus brantii: şabelûyêre
Quercus libani: dara xozbalî /azgilêre
Quercus petraea: patîlêre
Rubus canescens: birra dirikî / dirikêre
Salix: dara valî, vîyalêre / xarbêre
Sorbus aucuparia: vermurîyêre
Ulmus campestris : vizêre / viznêre
Vitis vinifera: mahşlêre / mewşêre
Ziziphus sativa: enabêre

# Çand-huner û siyaset





FEHMİ ATMACA

ÇAND û huner, bi jîyanê ve wisa girêdayî ye ku jîyana bê çand û huner mîna mirovekî rût û tazî ye. Gava mirov berê xwe dide dîrokê; civakên ku çand û huner afirandine û geş kirine, ew civak pêşkêtî ye û hebûna xwe domandîye. Ew civakên ku bi çand û hunerê re eleqeder nebûne kûrahîya di dîrokê de an qediyane, xilas bûne an jî bûne kolêyên civakên pêşketî.

Benî adem (însan) hebûneke bîyolojîk e, hebûna xwe heta hetayê nikare bidomîne. Lewre ji bo Benî adem mirin heye û benî adem fanî ye. Lê çand û hunera ku benî adem afirandiye, heta ku nifşên benî adem hebe wê geş be, dewlemend be, bidome û bi pêş keve.

Çand, tiştekî him bûjenî (maddî) him jî menevî ye. Nifş bi nifş didome. Herçî tiştên bûjenî û manevî ku di pêvajoya dîrokê hatine afirandin, ji wan hemû tiştan re çand tê gotin. Çand, nirxên civakan e, ji ber ku çand civakê diafirîne. Bi vê sedemê çand malê civakan e, ne yê kesan e.

Çand û dibistana (mekteb) ku mirov dixwîne ne yek in, çand tiştekî din e, dibistan tiştekî din e. Divê mirov cudatîya perwerdehîyê û çandê baş bibîne. Mirovek dikare perwerdehîyeke baş bibîne, li ser mijarekhe bibe pispor; ew pispor dibe ku di mijara pisporîya xwe de karên baş û kêrhatî bike û ji bo mirovahîyê pir bi sûd be. Dibe doktorekî baş, parêzerekî baş, endezyarekî baş, mamosteyekî baş an jî karê wî her çi be baş be. Lê ew pisporî nikare ewî mirovî bike mirovêkî çandyar.

Di navbeyna dîplome û çandê de bi qasî çîyayekî cudatî heye.

Çand tiştekî îzafî ye: Du kesên ku malbata wan yek be jî, di nav wan de di derheqê nêrîn û terzê jîyanê de meriv dikare cudatîya çandî bibîne. Terzê wan ê jîyanê û nêrînê wan a jîyanê ne wek hevin.

Huner jî; feraset û vegotina yekbûyî ye, asanî nîne, navdar (populertî) nîne. Huner, di pêşketina civakan de erkeke (rol) girîng dilîze. Pîvana geşbûna milletekî, bi guhdarîya wî ya muzîkê xuya dibe.

Milletekî bê huner bimîne damareke wî yê jîyanê kêm e. Milletek ku hunerê çêneke, peykeran çêneke, tiştên fennî çêneke ew millet di rêya pêşketinê de cîhê wî tune ye.

Di nav netewe û olan de jî pir cudatî hene, ew cudatî ji cudatîyên civakî pir kûrtir û mestir in. Li ser rûyê dinyê cur be cur millet hene, ji dîroka kevnar hetanî îro, ew milletên ku ziman û çand û hunerên xwe parastine û geş kirine hebûna xwe domandine.

Di nav milletên cînar de dayîn û sitendina çand û hunerê çêdibe. Lê ev nayê wê wateyê ku çand û hunera wan cînaran yek in. Yek nîn in, lê hinekî li nav hev ketine. Bi geşbûna teknolojîyê re jî, çand û hunera hemû milletên dinyê li hev qelibiye û li nav hev ketiye. Ev rewşa hanê îşaretên globalîzmê ye.

Ji bo dewlemendîya çand û hunera globalîzmê, hewce ye her millet çand û hunera xwe biparêzin û bi pêş de bixin. Ew milletên ku siyaset di ser çand û hunerê re girtine, bi paş de mane. Çand û huner ku di ser siyasetê re be ew millet bi pêş dikeve, di şarezatîyê de (medenîyet) jî bi pêş de diçe. Eger ku siyaset, hem ji bo desthilatdarîyê û hem jî ji bo geşbûn û pêşdeçûna çand û hunerê pêk bê, wê çaxê siyaset watedar dibe. Ew milletên ku ji çand û hunerê zêdetir her dem siyasetê derxînin pêş, ji şûndemayînê qet xilas nabin.

Milletekî ku bixwaze ji bindestan rizgar be û di qada civakî de bi pêş keve divê çand û hunera xwe di ser siyasetê re bigire.

Welatên pêşketî, çanda nûjen (modern) li ser koka çanda xwe ya kevnar an jî klasîk damezirandine, ew geş û dewlemend kirine. Ew welat ji çanda xwe ya kevnar şerm (fedî) nakin. Çunkî dizanin çanda kevnar koka wan e, dîroka wan e. Ji ber vê yekê li çand û hunera xwe dibine xwedî û îmkanên xwe zêdetir ji van tiştan re terxan dikin.


Welatên bişûndemayî yên wek rojhilata navîn, sedemeke şûndemayîna wan a herî girîng ew e ku ew bi çand û hunera xwe re zêde eleqeder nabin. Wekî ku tê zanîn, rojhilata navîn erdnîgarîyeke pir kevin e û çavkanîya çandê ye. Mixabin destpotîzmê nehiştiye çand û hunera vê erdnîgarîyê geş bibe. Despot, çand û hunera geş û pêşketî, ji bo desthilatdarîya xwe weke xetereyekê dibînin. Bi vê sedemê, ji çand û hunera geş û pêşketî gelekî ditirsin. Çand û huner civakan zanyar û şîyar dike û bi pêş dixe, di civakên pêşketî de cîhê despotan jî namîne.

Milletekî wek milletê kurd, ku bi sedan sal e bi çand û hunera wan hatiye lîstin û hatiye helandin; divê zêdetir li çand, huner û dîroka xwe xwedî derkeve û giringîyê bidê.

Çand, huner û dîroka me kurdan a nivîskî pir kêm e, bi zargotinan hatiye roja me. Çand, huner û dîroka nenivîsî bi tunebûnê re rûbirû dimîne. Divê kurd dezgehên çand û hunerê zêdetir bikin da ku bibin milletekî gihîştî. Hinek dezgehê bi navê kurdî hene, lê gelo li ser çand, huner û dîroka xwe çiqasî dixebitin? Dezgehê heyî, divê nebin paşbaxçê siyasetê, bila li ser karê xwe bixebitin bes e, ew karekî ne piçûk û asan e. Karekî pir pîroz e.

Li pêşîya me kurdan xetereyeke weha heye: Kî çavê xwe vedike bi sol û goreyan dikeve kûrahîya siyasetê, helana li xwe hildide û dibêje: ez ê di nava çend salan de milletê xwe rizgar û azad bikim. Belê, ev daxwaz û nêteke pir baş e. Lê ku tu bi zimanê xwe neaxivî, bi çand, huner û dîroka xwe nizanibî, ka tê çi rizgar û azad bikî? Ew kurdên ku dibêjin em ji welat û milletê xwe hez dikin, divê li ser vê mijarê hinekî biramin û bifikirin.

Yên ku ji bo rizgarîya kurdan têkoşer in û sîyasetê dikin divê kumê xwe deynin ber xwe û  ji xwe re çend sewal û pirsan bikin.



JAN DOST

## Rola rewşenbîr

“Rewşenbîrekî bêdeng, bi taybetî gava ku bûyer mezin bin û hemî civak têkildar be û mijar mijarên girêdayî raya giştî bin, mîna şeytanekî lal tê binavkirin.”

Ji mêj ve, ji sedê salan û belkî bêtir ve behsa rewşenbîran û rola wan di civakê de dibe, behsa bandora wan li bûyeran û li guhertina civakan dibe. Her weha ji sedê yan tew hezarê salan ve ye ku desthilatdarîya siyasî rola nivîskaran, helbestvanan û her cûre afrêneran dizanin û nas dikin. Giranîya gotinên wan dizanin û ji ber vê yekê jî gelek şahan, gelek sultanan û mîran helbestvan nêzîkî xwe dikirin qelemên wan dikirrîn. Çawa qelem dihatin kirrîn? Wa desthiladaran zêr bê hesab didane kesên ku anîne ba xwe da ku pesnê desthilatdarîya wan bikin û ji xelkê re wê desthilatê bixemilînin, kirasekî qeşeng li tazîtîya kirêt ya desthilatê bikin û li ber çavên xelkê şêrîn bikin. Yanî bi kurtepeyvekê wan dixwest ji xwe borîzan û zirneyan peyda bikin ku bi bi şev û roj ji desthilatê re lê bidin û awazan derxin. Helbet kesên ku ev rol nedipejirandin jî hebûn, kesên ku rexne li desthilatê dikirin jî hebûn û bê guman buhayekî mezin jî didan û carnan ji bo bîr û bawerîyên xwe dihatin kuştin jî.

Wek du mînakên berz û li ber çavan di mêjûya wêjeya kurdî de Ehmedê Xanî ku rexne li desthilatê dikir, û Melayê Cizîrî ku xelk rexne dikirin lê pesnê desthilatê dikir, hene.

Erê rewşenbîr wisa ne, yanî du par in, parek li gel desthilatê ye, yek jî li dij e, beşekî sêyem nîne. Ewê ku dibêje ez ne bi vî re ne bi wî re me derewan dike, di rewşenbîrîyê de ARAF nîne, yan dojeh e, yan bihuşt. Yan bi zaliman re yan jî li dijî wan.

Bêdengî qet ne ji sinç û exlaqên rewşenbîran e. Rewşenbîrekî bêdeng, bi taybetî gava ku bûyer mezin bin û hemî civak têkildar be û mijar mijarên girêdayî raya giştî bin, mîna şeytanekî lal tê binavkirin. Bêdengîya rewşenbîran sûc e ne jêhatîbûn e, gunehkarî ye ku rewşebîrek zulmê bibîne û destnîşan neke. Rola wan ew e kur aya giştî ava bikin, bingeha fikreke dijberî zulmê di civatan de deynin. Lê mixabin ev rol bi awayekî bi rêkûpêk nehat lîstin.

Ev bûne bêtirî pênc salan ku li Sûrî him şoreşek mezin li dijî rejîmê lidarketî ye, him jî şerekî bêrawestan ji hêla rejîmê û alîgirên rejîmê li dijî gelê serhildêr tê meşandin. Bi milyonan derbeder bûne, bi sedhezaran hatine kuştin, birîndar bûne û di zindanan de ne û winda ne. Helbet rewşenbîr tenê dikare helwesta xwe bide, dikare xwe alîgirê vî terefî û wî terefî bide nasîn û wek ku niha buhurî ew dikare bi hêza fikrên xwe raya giştî li dijî zulm û sitemê bihêvoje lê mixabin heta ev rola biçûk jî ji hinan nehat û helwest nedan.

Ez bi xwe dibêjim û bawer im ku di van krîzên mezin de, di şoreş û şeran de rewşenbîrek yan deh yan sed jî nikarin guhertinên mezin pêk bînin, ew tenê dikarin helwestên xwe ji raya giştî re bibêjin. Ev karê ku li wan ferz e û ne ku bi wê minnetê dikin. Lê mixabin me dît ku gelek rewşenbîr ne tenê rola xwe wek rewşenbîr nelîstin lê wan destbirakîya hêzên sitemkar jî kirin. Gelek rewşenbîr, çi ereb çi kurd, di xendeqa zaliman de man, xwîna ku ewan zaliman dirijand û dirijînin qet nebû naqosek ku wijdanê wan ji serxweşîya giran hişyar bike, xwîna bêgunehan î ku li kolanan, di şer de, li zindanan rijiyayî qet nebû agirekî gurr û geş ku rêya rast û ronî nîşanî wan bida.

Ez dixwazim li dawîyê bibêjim ku, rast e rewşenbîr nikare guhertinên mezin di roj û şevekê de li dar bixe, darekî sihirbazan di destê wî de nîne ku bide keviran û bike zêr, na, rewşenbîr her wekî ku seydayê mezin Xanî dibêje: tawan çiya şair û feqîran? Anku ma rebenê rewşenbîr dê çi karibin bikin ku desthilata siyasî hemî hêz xistine destê xwe? Lê mirov nikare bibêje ku rewşenbîr hîç nikare tiştekî bike, ew dikare bi kêmanî ji zulmê re bibêje na, ji xwînrêjîya bêgunehan re bibêje na, ew dikare hizrên xwe bibêje û ew hizr mîna avê hêdî hêdî, dilop bi dilop dikare zinaran jî qul bikin.

Rojên xweş û rojên reş

# Li “Medya Kitabevi” ango Kitêbfiroşê Medyayê -II



CIWANMERD KULEK



PIŞTÎ ku di sala 2000î de Medya Kitabevi ji Pasaja Aznavurê derket û hat ket cîyê xwe yê îro ê li Pasaja Elhamrayê, seqamgîrîyeke binisbet li hawirdorê çêbû. Selahattin bi dilekî hinekî ji berê rihettir û bi hêvîyeke xurttir di nav pêlên qelebalixîya rengîn a mirovan de li Cadeya İstiklalê dimeşiya û diçû karê xwe. Kitêbên Kurdî êdî bêtir çap dibûn, refên dikanê hêdî hêdî tije dibûn. Wext hatibû ku qabên piskuwîtan ji pişt kitêban derxe û bavêje: êdî kitêb encaq dema ku kêlek bi kêlek dixistin refan di dikanê de hildihatin. Tirs û fikara berê hinekî ji ser xelkê radibû. Kitêbfiroşîya Medyayê berê di Newrozan de Elîfbayên Kurdî belaş li xelkê belav dikirin, û rojên îmzeyê bo nivîskarên wek M. Uzun, Naci Kutlay, Celîlê Celîl li dar dixistin û bi vî rengî xwendevan dikişandin, lê êdî bêyî van çalakîyan jî hejmareke bêtir a mirovan ji ber dêra San Antuan berê xwe dida hember, diketin hundirê Pasaja Elhamrayê û qesta kitêbfiroşê Kurd ê li qorzîka dawî a vê pasajê dikir.

Demekê bi şûn de, nehatina polîsan û nebûna serdegirtin û desteserkirinan êdî hatibû radeyeke wisa ku ji Selahattin Bulut re nenormal xuya dikir. Çaxa li Tirkiyeyê kitêbek dihat qedexekirin û biryara berhevkirina wê derdiket, polîs diçûn hemû kitêbfiroşên Stenbolê û ew pirtûk hildidan, lê tew wê hingê jî -ka bê çima!- berê wan nediket dikana wî û nedihatin kitêbên qedexekirî jî ji kitêbfiroşê Medyayê hilnedidan. Selahattin piştî biryarên mehkemeyê ên komkirina kitêbên qedexekirî bi rojan, bi mehan li hêvîya wan dima, lê nedihatin. Şik û gumanên wî ên ku tiştek di bin vî îşî de hebû zêde dirêj nekir û di tirsa xwe de derket: di 2006an de, malpereke înternetî a ku derdorên netewperest ên ku gef li nivîskar û rewşenbîrên wek Orhan Pamuk û Hrant Dink xwaribûn ew bi rê ve dibir, bi nav û nîşan behsa Medya Kitabevi dikir. Malperê ew bi xebatên civandin û birêxistina Kurdan, anîn û firotina kitêbên li ser Kurdan û Kurdistanê tohmetbar dikir û ew eşkere dikir hedef û amanca êrîşan. Piştî wê bi demeke kin Hrant Dink hat kuştin, Orhan Pamuk rabû derket derveyî welat; lê Selahattin Bulut li quncika dikana xwe ya li dawîya Pasaja Elhamrayê, li kitêbfiroşîya ku rihê xwe xistibû devê xwe bo ku wê li ser pîyan bihêle, bi tena xwe, bê pal û pişt, mabû. Rojên xezebê, rojên bi saw û xof, ji bo wî ji nû ve dest pê kir. Demên ku ji mala xwe derdiket, demên ku di rê de diçû, demên li dikanê rûniştî bû bi tirs û fikara wê talûkeyê dijîya ku ne diyar bû dê ji kê, kengî û çawa bihata. Wexta derketina ji kar, carina hevsera wî dihat pêşîya wî. Wexta dê ji mal derketa biçûya kar jî, wan pêşî di pencereyê re li derve dinerî bo ku hişyar bin li wê metirsîya ku nikaribûn bi nav û nîşan bikin, û dawîyê derdiket derve. Piştgirîyeke dî a ku di wan rojên reş û giran de girtibû ti car ji bîra wî neçû. Mihemed Sanrı, nûnerê Kurdistan TVyê ê wê demê, dema diçû kar jina xwe û keçika xwe ya piçûk dianî datanî dikanê û dû re diçû karê xwe. Ev mertala mirovî carina diket halekî wisa ku, Selahattin Bulut, hevsera wî Filiz xanim, Mihemed Sanrı, hevsera wî û keça wî, giştûk bi hev re li hundirê dikanê rûdiniştin û bi xem û fikar li kesên di ber pencereya dikanê re derbas dibûn dinerîn û diqilqilîn: “Gelo..?”

Hîn Selahattin wiha di nav saw û waswasê de ji her kesê ku di wir re derbas dibû bi guman diket û di dilê xwe de her tim digot “gelo ev e ê ku bera min bide?”, ew ewrên reş ji nişka ve belav bûn. 12ê Hezîrana 2007an, li xanîyekî kevn ê li taxeke Stenbolê gelek teqemenî hatin dîtin û pêleke mezin a hiqûqî li Tirkiyeyê dest pê kir. Di çarçoveya têkoşîna li dij hin pêkhateyên kûr û tarî ên di nav dewletê de her roj iddîa û dozên nû li dijî van komên pirranîya wan ji derdora artêşê derketin, gelek kes hatin hepiskirin û ew malperên ku Selahattin Bulut jî kiribûn hedef yek bi yek hatin girtin.


**“Medya ne tenê kitêbfiroşek e”**

Hinga hevpeyvînê, pêlekê ez û Selahattin Bulut rabûn, em bi nav refên heta ser dev dagirtî ên li hundirê dikanê ketin. Bi hesabekî teqrîbî me têderxist ku texma 2.000 kitêbên Kurdî û 3.000ên bi Tirkî li Medyayê hene. Ewqas kitêbên çi ên bi Kurdî û çi ên li ser Kurdan li cîyekî dî, qet nebe li Stenbolê, peyda nabin. Ên ku rîya wan bi Medyayê dikeve şaş dimînin çaxa ewqas kitêbên Kurdî, ji her weşanê, li ba hev dibînin: ne ji ber ku ev hejmareke piçûk e, lê ji ber ku hejmareke mezin e. Nexasim li welatekî ku tenê di salekê de heşt qatên vê hejmarê pirtûkên bi zimanê Tirkî derdikevin.

“Ferqa me ya ji kitêbfiroşên dî,” Selahattin diyar dike, piştî ku em li cîyê xwe rûdinên, “li wan cîyên dî tu diçî pereyê xwe didî, kitêba xwe distînî û derdikevî. Lê ê me xelk ne tenê ji bo ku pirtûkekê bikire, ji bo ku çayekê vexwe, sohbetekê bike, pirsa hal û hewalên dinyayê bike û hinekî bêhna xwe derxe tên ba me.” Li gor Selahattin sedemeke ku Kurdan ew cî weke ê xwe dît jî ew bû ku ew hemû weşanên Kurdan tînin wir û her kes parçeyekî ji xwe li wir dibîne.

Çalakîyên terorî ên li Stenbolê ên vê dawîyê mixabin krîzeke nû anîye ber derîyê kitêbfiroşê Medyayê jî. Evê sal û nîva dawî (Selahattin teqîna Sirûcê a 20ê Tîrmeha 2015an wek xala destpêkê a vê pêvajoya kesadiyê nîşan dide) di 21 salên Medyayê de bûye serdema herî xirab ji alî bazara pirtûkan ve. Selahattin Bulutê ku vê sal û nîvê tê belaş dişixule li Medya Kitabeviya ku mesrefên xwe bi zorê ser bi ser derdixe, neçar maye bi saya miaşê xwe yê teqawidîyê debara xwe bike. Piştî ewqas karesat û bobelatên li pey xwe hiştin, bi berxwedêrîya temenekî têr û tije, li hember vê rewşa nû ya aloz jî hêvîyên xwe winda nake û bi biryar e heta dawîyê Medya Kitabevi zindî û vekirî bihêle. Vî cîyê ku serencama wê dişibe qedera Kurdî, li hêvîya wan rojan e ku peyv û nivîsa Kurdî qedr û qîmeta xwe bigire.

> “Li gor Selahattin Bulut sedemeke ku Kurdan ew cî weke ê xwe dît û qebûl kir jî ew bû ku ew hemû weşanên Kurdan tînin wir û her kes parçeyekî ji xwe li wir dibîne.”



> “Kitêbên ku eger qedrê wan bê zanîn dikarin qedera Kurdan biguherînin û bextê wan xweştir bikin bi hejmareke ku di vî sed salê çûyî de hîç neketibû ser hev di wê qorzîka dikanê de li hêviya xwediyên xwe ne. “

## SELAHATTİN BULUT

Selahattin Bulut hînê şagirtekî piçûk bû, gava li Tirkiyeyê derbeya leşkerî a yekem (1960) rû da, û wê demê pirtûkên wî yên dibistanê ji destê wî çûn. Di derbeya ku piştî vê bi deh salan qewimî de vê carê ji şeş pirtûkên xwe (*Elfabeya Kurdî* ya M. E. Bozarslan, *Şerefname, Birîna Reş, Di Dîroka Kurdistanê de Dêrsim, Dîwaneke Cegerxwîn* û kitêbeke İsmail Beşikçi) tenê yek, *Şerefname*, ji şewitandinê rizgar kir. Lê derbeya sêyemîn a deh sal şûn de ne ewqas bi rihm bû; ne tenê kitêb û kovar û plak, heşt salên wî jî ji wî standin.

Selahattin di 1979an de xortekî 25 salî bû gava wek mamoste dest bi kar kir. Cîyê ku bo vî karî çûyê jî ne di xewnê şevan de dîtibû, ne jî bihîstibû. Heşt mehan li vî gundê li ser sînorê Sovyetan, gundê Terekemeyan ê bi navê Hesençawîşê, ku bi ser qezaya Arpaçaya Qersê ve ye, kar kir. Dema ji wir vegerîya Mêrdîn bo ku cîyê karê xwe biguhere û bîne vî bajarê bav û kalên xwe, qesta daîreya perwerdehîyê kir. Li wir li nasekî xwe rast hat û jê fêr bû ku esker li her derê li wî digerin. Selahattin wê çaxê endamê KUKê (Rizgarîxwazên Netewî ên Kurdistanê) bû. Ji wê rojê şûn de rojên wî yên rev û xweveşartinê dest pê kir; bêyî ku berê xwe bide mala dêûbavê xwe, xwe ji navê da alî. Di wê demê de ku li Tirkiyeyê derbeya eskerî a sêyem bûbû, pêlekê Selahattin Bulut tevî hevalekî xwe xwe li axurê mala hevalekî xwe yê dî ê ji tevgerê veşart. Ji bo dema ku esker hatin avêtin ser wê malê ew nedîtana, mazûvanê wan di binê alifê kerê xwe de koncaleke bi qandî ku herdu heval tê de hilhatana kola û bi mirdiyaqan qapaxek jê re çêkir. Dema ku esker hatin herdu hevalan dê bi bistikê wê devgirkê bigirtana û ew bi ser xwe de bikişanda û bigirta. Hesab ew bû ku kerê jî dê ji xwe re êmê xwe bixwara weku tiştek li wir tine bû. Di dawîya van rojan de ku xanima malê xwarina wan ji wan re dianî axur û hemdem rêsîyê kerê xwe didayê û her kesî ji alîyekî de li axur xwarina xwe dixwar, esker nehatin û dawîya dawî ji wir derketin. Piştî ku ji qampeke KUKê a li Zaxoyê vegerîya û berê xwe da Sûrîyê, 1981, bo ku tevlî kongreya vê tevgerê bibûya, li Antaqyayê hat girtin. Hingê Selahattin Bulut ket girtîgeha Diyarbekirê û encaq di 35 salîya xwe de ji vê dojehê derket. KUKa ku berî girtina xwe diçû ku tevlî kongreya wê ya li Sûrîyê bibe ku dê tê de biryar bidana ka di wê rewşa derbeya leşkerî a li Tirkiyê de çawa tevbigerin, piştre bûbû du parçe û dawîyê bi temamî ji hev belav bûbû. Selahattin Bulut, piştî ku ji girtîgeha Diyarbekirê derket bi salekê, hat Stenbolê û hîn jî li vî bajarê ku di temenê xwe yê dirêj de li ti dereke dî ewqas nemaye dijî.

Selahattin Bulut ne tenê xwendevan, firoşkar û parêzvanê pirtûkan e. Wî herwiha ji çavdêrî û serborîyên xwe du pirtûkên bi zimanê Kurdî jî berhem dane: *Bihuşta Lal* û *Xadim*. Selahattin bi biryar e ku heta qaweta wî bigihêjê kitêbfiroşîya Medyayê bike û bi vî rengî li xerîbîyê be jî xizmetekê ji Kurdistanê re bike. Roja hevdîtina me ez serwext bûm ku digel emeliyatên dil ên ku zehmetîyeke mezin dabûnê jî enerjîya wî ya jîyanê û geşepêdanê bêdawî ye. Pêlekê çavê min li kevirekî binevşî û pîjik-pîjikî ê li ser maseya wî ya qelabalix ket û min di dilê xwe de got qey ji bo enerjîya vî kevirî a ku hundiran xweş dike û nexweşî û belayan diqewirîne daniye wir. Lê na, Selahattin evî kevirê ametîs li Tahtakaleyê dîtibû û kêfa wî ji şiklê wî û rengê wî re hatibû. Ne tenê ji vî kevirî, Selahattin Bulut ji hemû cureyên keviran hez dike û eşqeke wan çêbûye di dilê wî de. Ev hezkirina keviran ji xanima wî Filiz Işık Bulut, ku ev pazdeh sal in bi hev re ne, derbasî wî bûye. Filiz Xanima ku heta niha çar kurtefilîm kişandine (ku Selahattin jî tevkarî di wan de kiriye, û ê çaremîn, *Zelal*, piştî hevpeyvîna me bi sê rojan cara yekemîn li festîvala filîman !f İstanbulê derket pêşberî temaşevanan) biçûya kîjan bajarî yan welatî kevirekî aydî wan cîyan teqez bi xwe re dianî.

Kevirê ku qedera Kurdistanê biguherîne li kû ye, çawa ye nizanim; ihtimal e ku tine yan ê kesek ji me re neyne, lêbelê kitêbên ku eger qedrê wan bê zanîn dikarin qedera Kurdan biguherînin û bextê wan xweştir bikin bi hejmareke ku di vî sed salê çûyî de hîç neketibû ser hev, di wê qorzîka dikanê de li hêvîya xwedîyên xwe ne.



**FIRAT CEWERÎ**

## Arjen Arî

Di hemû kultur û hemû deman de behsa demên bihurî û xweşbûna demên bihurî tê kirin. Ji ber ku bîranînên mirov bi demên bihurî re hene. Zarokatî û xortaniya mirov di demên bihurî de dimînin, ew dem jî zaroktî û xortaniya mirov bi xwe re dibin û dibuhurin. Ya ku mirov li dû ye, ji demên bihurî wêdetir, di eslê xwe de zaroktî û xortanî ye. Ew zaroktî û xortaniya spehî ye, ya ku bi hemû spehîtiya xwe bi demê re bihuriye û çûye. Di destê mirov de, di neynika hember de, porê spî, rûyê qermiçî, pişta tewiyayî û êş û elemên laş ên nediyar mane.

Gava ez li demên bihurî digerim, xortaniya min bi destê min digire û min dibe Nisêbîna salên heftêyî. Hebûna stasyona trênê, pira Alman ya ku trêna reş wek marekî li ser diçerixî û dixaneke spî bi ser xwe dixist, çemê wê yê mezin ku bajar dikir du beş û ber bi binxetê ve diherikî, dar û berên wê, sînemayên wê ên sergirtî û servekirî, mirovên wê ên bajarî, keç û jinên wê ên medenî û spehî, kozmopolîtbûna wê û toleransa wê, Nisêbîn wek bajarekî hevdem di dilê min de bi cih kiribû. Ez bi zaroktiya xwe li vî bajarî tevdigeriyam, ez li vî bajarî bûm naşî û derbasî xortaniya xwe bûm. Ez di çemê vî bajarî de fêrî avjeniyê bûm, min li vî bajarî xwe fêrî ajotina bisiklêtê kir, cara pêşî min li vî bajarî bi kelecenake mezin keçikek maçî kir. Min herî pir li vî bajarî slogan li ser dîwaran nivîsandin. Herweha min li vî bajarî ji nişkê ve qelem di destê xwe de dît û bi kurdî helbest lêkirin.

Salan xwe gihand 76an. Min û Arjen Arî hingî hevdu li Nisêbînê nas kir. Piştî saleke din êdî em bûn agir û pêtî. Me digot em ê tavilê şoreşê bikin, rewşa xwe biguherin û bibin dikên ser sergoyên xwe.

Em bûbûn wek misyoneran, em bi şev û roj dixebitîn. Me bi rojan propogandaya hişyarbûnê ji xelkê re dikir, em bi şevan jî bi satilên boyaxê li kuçe û kolanên bajêr digeriyan û me xaniyên xelkê ên spehî di sloganên xwe ên çeloxwarî de dihiştin.

Hingî dema rêkxistinan bû. Ez û Arjen jî di rêkxistinekê de hatibûn ba hev. Em pê ketibûn û me xwe bi felsefeya materyalîst digihand; em noqî lîteratura Marksîzmê bûbûn û me qirik li hev diqetand. Em jî wê derbasî xwendina şaîrên şoreşger, çep û serîhildêr bûn. Ji bilî Nazim Hîkmet û Ahmet Arifê ku me bi şev û roj dixwend, em bi ser Mayakovskî, Neruda û Lorca jî ve bûbûn. Bi taybetî jî bi serkêşiya Mayakovskî tevgera futuristên ûris tesîreke mezin li me dikir.

Di vê navê de me li Nisêbînê komeleyeke bi navê Komeleya Xortên Şoreşger ên demokrat vekiribû. Ez, Arjen Arî û Ekrem Kut ji bo komîteya karger ya komeleyê hatibûn hilbijartin. Piştî demekê Ekrem ji Nisêbînê koç kir, birêvebirina komelê di destên min û Arjen de ma. Di wê navê de qelem û kaxez ji ba Arjen kêm nedibû û ha ha şiir dinivîsandin. Di kurdî de bûbû rengekî din ê Ahmet Arif. Ji xwe re defterek girtibû û deftera xwe dagirtibû. Arjenê diltenik, dil jî girtibû. Lê dildara wî li aliyê xetê e din bû, li pişt têlan, li Qamişlokê bû.

Rojekê helbesteke xwe ji min re xwend, beşek ji wê helbestê hê jî di bîra min de ye:

*Ez bibêjim lê, wê deng bê te*
*Lê ev têl, ev mayin, ev leşkerên rom*
*Ne dihêlin bang bikim, ne jî dihêlin bêm.*

Di dawiya salên heftêyan de haziriya derxistina kovara Tîrêjê dihat kirin. Min helbestên Arjen Arî û karikatorên Niyazi Yıldırım, (navê wî ê hunermendiyê Çep bû) birin Diyarbekirê û teslîmî hevalên Diyarbekirê kir. Piştî demekê, êdî Arjen Arî herfên xwe ên reş li ser kaxeza spî dîtibû, şûr simêlê wê nedibirî. Êdî şair bû, helbestên wî hatibûn weşandin û wê di riya xwe de dewam bikira.

Piştî cûntaya 12 îlona 1980 û heta salên 1990î jî Arjen Arî bêdeng mabû. Helbestên ku dinivîsandin jî di tûrikê xwe de hiltanîn, an jî kêm dinivîsand. Gava min di sala 1992an de dest bi weşana Nûdemê kir, min li deriyê Arjen Arî jî xist. Heta hingî jî navê wî ne Arjen Arî bû. Ez dibêjim cara pêşî wî ew nav di Nûdemê de bi kar anî. Heke ne cara pêşî be jî wî herî pir ew nav di Nûdemê de bi kar anî û bi Nûdemê navê Arjen Arî belav bû.

Arjen Arî diltenik bû, zû evîndar dibû; yanî şair bû. Arjen jîr bû, kursiya xwe dadigirt. Arjen şên bû, bi dora xwe re xweş dikir. Arjen ne mirovekî tengijî û dexsokekî jirêderketî bû; henekçî û sohbetxweş bû. Zarê Arjen şêrîn bû, kes jê aciz nedibû. Arjen jixwehez bû, kincekî xweşik li ku hebûya wî ê li xwe bikira, pêlavên wî ne wek ên her kesî bûn. Arjen ferqa nifşan rakiribû, bûbû îdolê xortan. Dilê Arjen hertim xort bû. Arjen jî wek Mehmed Uzun û Mahmud Baksî bîra mirina her kesî dibir, lê bîra mirina xwe nedibir.

Nizanim, ez dikim nakim devê min nagere ku ez bibêjim Arjen miriye… Arjen Arî ye…

# Ercan Bîngol:

# Hêmanên muzîka me û afro-amerîkîyan hevpar in



“Piştî ku min li ser dîroka wan lêkolîn kir, min dît ku ji hêla civakî ve gelek hêmanên me yên hevpar û afro-amerîkan hene: Bindestbûna wan, neazadbûna wan bi min wisa hat ku ti ferqa wan û kurdan tune ye.”



NÛJÎN ONEN

**AYA** bluesa kurdî jî heye? Belê heye, ka werin vê şêwaza ji rojavayê Afrîkayê, xwe çawa gîhandîye muzîka kurdî em bi hevdu re bibînin. Muzîka blues celebeke muzîka Afrîkayê ye, dema afrîkî weke “karker” li nav zevîyan dixebitîn, di ber re jî bi awayekî xwezayî ev şewaza muzîkê kişf kirine û vejandine. Em dikarin bibêjin êş, keser û zilma li reşikan bûye tovên muzîka bules û blues şîn hatiye. Hunermendê kurd Ercan Bîngol dibêje ‘‘êş û zilma li reşik û kurdan dibe wekî hev in û ev şewazeke civakî ye” û didomîne “Ev yek bû sedem kuez berê xwe bidim deryaya bluesê û min got çima blues bi kurdî jî nebe?” Ercan Bîngol ji gundê Xinzora Gimgimê ye, niha li Enqereyê mamostetîya îngîlîzî dike, lê ji alîyê din ve di muzîka kurdî de bi şêwazeke cuda derdikeve pêşberî me. Albûmeke wî bi navê Ron heye. Di albûmê de motîfên blues-country hene û ji 13 stranan pêk tê. Muzîkjen Ercan Bîngol ji heftenameyê Basê re behsa bluesa kurdî kir û raya xwe ye derbarê muzîka kurdî de ragihand.

Ercan Bîngol berê ji me re behsa dîroka bluesê dike û kurdên ku li nav zevîyan stran digotin û afrîkayîyên li nav zevîyan stran digotin muqayese dike û wiha dibêje: “Blues wekî şêwaz 200 sal berê derketîyê holê û muzîkeke afro-amerîkî ye; amerîkîyan koleyên afrîkî ji welatê wan dûr xistine û ew anîne Amerîkayê li ser erd û zevîyên xwe dane xebitandin. Dema dixebitîn jî çawa ku li Kurdistanê gundî tirpanê dike, wisa stranên xwe distrên û bi melodî û rîtmekê paleya xwe dikin. Li gundan, karên rojane çiqasî civakî be, di bin vê esaretê de muzîka blues jî ji hêla reşikan ve bi awayekî civakî derketîye holê. Stranên wan ên herî pêşîn bi navê stranên zincîrê ne, lewre dest û lingên wan zincîrkirîbûn û hem kevir dişkenandin hem jî stranên xwe distran. Yekî dest bi stranê dikir, koma pêy wî jî gotin li wî vedigerandin. Piştî ku min li ser dîroka wan lêkolîn kir, min dît ku ji hêla civakî ve gelek hêmanên me yê hevpar û afro-amerîkan hene: bindestbûna wan, neazadbûna wan bi min wisa hat ku ti ferqa wan û kurdan tune ye. Min got qey behsa kurdan dikin, ne behsa afro-amerîkîyan an welat û dîrokeke din dikin. Vî tiştî ez nêzî vê şêwazê kirim û ber bi bluesê ve çûm. Min got divê ev şêwaz bi gotinên kurdî jî were ava kirin. Ez dikarim bibêjim ew tarzeke civakî ye: ne wekî jazzê elîtîst e, ne wekî muzîka pop, populer e. Dema tu berê xwe didî Delta Blues an jî Chicago Blues gelek ji stranên wan behsa êş û keserên xwe dikin an jî henekên xwe bi êşên xwe dikin.”

“Ez dikarim bibêjim tarzeke civakî ye; ne wekî jazzê elitist e, ne wekî muzîka pop, populer e. Dema tu berê xwe didî Delta Blues an jî Chicago Blues gelek ji stranên wan behsa êş û keserên xwe dikin an jî henekên xwe bi êşên xwe dikin.”

Herwiha hunermendê kurd Bingöl destnîşanîyê bi muzîkjenîya kurdî jî dike û wiha diaxive: “Ez bi zimanê kurdî mezin bûm di malbatê de bi zimanê xwe em diaxivîn lê ez li Mêrsînê mezin bûm. Piştî destpêkirina dibistana seretayî, navendî û lîseyê mirov dikeve nav pergaleke din. Dema ez ketim nav wê pergalê, wê çaxê min fêm kir û got, Ercan tu ne aîdî vî warî yî, ji ber ku her tiştê vê derê ji te dûr e xerîb e. Heta ku mirov tiştekî din nasneke, nikare xwe jî nas bike. Loma min xwe û kesên ku min nas dikirin dan ber hev du û min serê xwe bi cûdahîyan ve êşand û min dît ku zimanê me ne yek e. Min dît ku ew hîn bi xwe bawertir dijîn, bi hereket û axaftinên xwe. Em çima di quncikekê de wisa belengaz rûdinîn. Min dît ku tiştê ku min û wan ji hev cihê dike, ziman e.”

Di beşeke din a axaftina xwe de Bingöl behsa yekem strana xwe ya blues a bi navê “Bluesa Benda Sînê” dike û wiha dibêje: Berî min, kesin hebûn ku bi motîfên bluesê stran çêkiribûn. Mesela stran bixwe straneke gelêrî ye, an jî stran ber bi muzîka klasîk ya kurdî ve diçe lê bi motîfên bluesê hatiye neqişandin. Le me nedikar em bibêjin ev stran, straneke blues e. Bo nimûne stranên gelêrî yên bi navê “Zozan Zozan” û “Helîmcan” hene; tu dikarî van stranan jî bi motîfên bluesê bineqişînî, lê neqişandina van stranan bi vî rengî, vê stranê nake blues. Di albûma “Ron” de jî bi taybetî strana bi navê “Bluesa Benda Sînê” bi xwe straneke blues e, tu gotinên kurdî jê derxînî û gotinê îngilîzî li ser binivîsînî tu dikarî li Amerîka an jî li Îngiltereyê belav bikî. Berîya ku me ev albûm çêkir gelek stran hebûn ku bi motîfên blues an blues-rockê, jazzê hatibûn neqişandin lê bi taybetî jî bo strana “Bluesa Benda Sînê” dikarim bibêjim ku straneke slow blues di muzîka kurdî de cara yekem hate çêkirin.”

**Pirsa siyasî çareser nebe, pirsa ziman û hunerê jî çareser nabe**

Hunermendê kurd li ser polîtîzebûna muzîka kurdî gazinan dike lê vê yekê ne wek kêmasîyekê lê wek pirsgirêkekê dibîne û wiha dipeyive, “Niha di muzîka kurdî de bazara muzîkê qels e, muzîka kurdî ne tenê muzîka kurdî ye, di heman demê de xwe-îfadekirin e. Dibe ku yek stranên pir populer bi zimanê tirkî, îngilîzî muzîkê xwe çê dike û belav dike lê tu ne hunermend an muzîkjenekî wekî wî yî. Me dixwest her tiştê kurdî wek tiştekî polîtîk xuya neke. Di navrastîyên vê erdnîgarîyê de tu bi zimanê kurdî distrê, çîrok û pirtûkan dinivîsînî. Ev ji aliyekî ve polîtîk e jî, tu nikarî ji vêya birevî. Me hîn pirsgirêkên xwe safî nekirine ku em muzîkê an hunerê tenê wek hunerê, di wê çarçoveyê de, pêk bînin. Gelek pirsgirêkên me yên bi vî rengî hene: heke tu nikaribî bi zimanê dayika xwe perwerde bibî, dema ku te bi zimanê kurdî muzîka xwe îcra kir, tu behsa evîn an hezkirîyê xwe jî bikî, bêguman ev tiştekî ji alîyekî ve ecêb polîtîk e. Tu nikarî ji vê rastîyê birevî. Xwezî wisa nebûya, xwezî dema ku me bi kurdî



distra, tenê bi alîyê hunerî ve hatiba nirxandin. Di vê stran an albumê de behsa hêmanên hunerî bikirana, lê bêgûman tu çi bikî jî, alîyekî wê polîtîk e. Ev dezavantajek e bo muzîka kurdî. Ez nikarim bibêjim ev kêmasîya muzîka kurdî ye, pirsgirêka me yê kurda ye. Ji alîyê din ve jî heta tu pirsgirêkên xwe yên sîyasî çareser nekî tu nikarî pêşî li hunera zimanê xwe jî vekî. Ev tişt gelekî bi hevdu re girêdayî ye.”

Di berdewamîya sihbete me de Bingöl, behsa muzîk û komên salên 90î dike. Ligor Bingöl, di salên 90î de di warê muzîkê de berhemdarîyeke baş hebû û ew berhemdarîya hunermendên kurd ji şer dihat, lewre bi sistbûna şer re kom jî ji hev belavbûne û berhemdarîya hunermendan jî kêm bûye. Herwiha hin ji wan hunermendan jî dest bi çêkirina muzîka arabesk kiriye. Bingöl, albumên van salên dawîyê derketine rexne dike û wiha dibêje: Çima dibêjim erebî û arabesk? Ji ber vî tiştî ji rastîyên gelê xwe dûr ketin, ji loma muzîkeke arabesk anîn pêşîya me. Niha hin kes dibêjin çima hûn bi çavekî elîtîst li muzîka arabesk dinêrin. Mesela em çima dibêjin muzîka arabesk? Ji ber ku muzîka ereban e, ji loma. Muzîka arabesk kêfê dide ereban, ji bo wê hatîye çêkirin, bi keman û qanûnê ye; dema tu li yê orîjînal guhdar dikî, te dihejîne, derdê te bi te dide jibîrkirin. Lê ji bo kurdan ev pirsgirêkeke mezin e, ev jî kêmasîyeke muzîkjenên kurdan e ku muzîkekê bi vî rengî dûrî civata xwe tînin bi peyvên kurdî dineqişînin û didin ber me, ev dûrî rastîya civakê ye.”

Di dawîya axaftinê de, muzîkjenê kurd behsa albûma nû dike ku dê di pêşerojê derkeve û wiha dibêje: “Repertûwara albuma duyem amade ye, berîya tomarkirinê divê ez li ser aranjorîya wê bixebitim. Di wê albûmê de jî gelek tişt hene ku bala kurdan bikşîne, bi taybetî çend stranên suprîz hene. Bi min wisa tê ku dê ev albûm bêhtir ber bi bluesê ve biçe.”